

agiri

25'ê Gelawêjê, 16'ê Tebaxa 2007'an, 62 sal bi ser avabûna PDK Îranê de derbas dibe. Rojêke girîng û dîrokî ku têde yekemîn partiya modern û xwedî bername û armancên pêşketî yê xebata neteweyî - demokratîk ava bû. Em weke **Desteya Weşana Agirî**, pîrozbahiyên germ bona vê cejnê pêşkêşî xelkê Kurdistanê, Kadro, Pêşmerge û alîgirên PDK Îranê dikin.

Rojnameya panzdehroji ya wiyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê diweşîne

25' Gelawêjê Destpêka Şoreşeke Modern Di Dîroka Neteweya Kurd De

Cejna 25'ê Gelawêjê Bi Coşeke Mezin Hate Pîrozkirin

2
Peymana Sekreterê Giştî
Yê PDK Îranê
Bi Hinceta 25'ê Gelawêjê



4
Feyzma Dofêra Bîyad
Ya PDK Îranê De Kongreyê
Çarvata A YCDK Îranê



7
Daxuyaniya Hevbes
Derheq
Êrişa Teroristî Ya Şengarê



9
Hewgirtina Nistimani
Li Surayê



Bi boneya cejna 25'ê
Gelawêjê, 62'emîn
salvegera avabûna
PDK Îranê şahiyên
germ û berfireh
li Kurdistanê û
derveyî welat hatin
lidarxistin.

Li piraniya bajarên
Kurdistanê Îranê
gel bi awayekî bê
wêne û balkêş
pêşwazî ji vê cejna
dîrokî û girîng kirin.

Li gellek welatên Ewropayî,
Amerîkayê, Kanadayê
û Ustiralyayê Komîteyên
PDK Îranê ew boneya
dîrokî şeraz kirin.




Ji Bo Pêşve, Ber Bi Bidestveanina Armancên 25'ê Gelawêjê

Pîroz Bi 62'emîn Salvegera Avabûna PDK Îranê

25'ê Gelawêja 1386'an A Rojê 16 Tebaxa 2007'an Ya Zayînî

Towards the progression for fulfillment objects of 16 august

Happy and magnificent 62' anniversary of
Democratic party of Iranian kurdistan



Mafên Zarokan

Hespeyvin Bi Dara Natîq,
Sekreterê Giştî
Yê YCDK Îranê Re

Humermend
Tirêj Urmîye, Bo
Agirî Dipeyive

Peyama Serkreterê Giştî Yê PDK Îranê, Bi Boneya Cejna 25'ê Gelawêjê, 62'mîn Salvegera Avakirina Partiyê

H ewelatîyên hêja!
**Civatên xelkê mafxwaz yê
 Kurdistanê!**
**Kadro û Pêşmergeyên gel û
 partiye!**

**Endam û afgirên xebatkar ên
 Partiya Demokrat!**

**Malbatên serbilind yên Şehîdan û
 girtiyên xweragir yên siyasî!**

25'ê Gelawêja 1324 (16.08.1945)'an, yek ji rojên geşên dîroka teji evraz û nişîv ya neteweya me ye. Di wê roja ji bir nekîrî û pir rûmet de, Partiya Demokrat ya Kurdistanê, li ser destê rêberê hilkevî û leheng Pêşewa Qazî Mihemed û li ser bingehên rêxistinî yên **Komeleya Vejiyana Kurd** (J-K) hatiye avakirin û ji vê rêyê ve bizava neteweyî – demokratîk ya Kurdistanê gaweke bilind û girîng ji bo bidestveanîna maf û azadiyên xelkê mafxwaz yê Kurdistanê avêt.

Di wê serdema dîrokî de, ne tenê Kurdistan, belkî seranserê Îranê û heta herêma Rojhilata Navîn jî di bir û baweriyên kevn û sava û paşverû de nuqim bibû û hin sîstemên zordar û kevnepereşt çarenivîsa gelan bidestve girtibûn, yekem partiya modern û nûjen a Kurd hate holê û bidestveanîna mafê neteweyî, demokrasî û vegeandina serweriyê ji bo gel û xebat bona zeliqandina wêkheviya jin û mêran di civak û malbatê de bi eşkere aniye nava bername û piratîka xwe.

Partiya Demokrat a Kurdistanê, yekemîn partiya Kurdistanî bû ku pêwîstiya organîzasyonêkê ji bo pêşdebirina xebata neteweyî ya Kurd fêhm kir. Damezrandina Yekîtiya Ciwanan û Yekîtiya Jinên Demokrat ên Kurdistanê di şex deheyan berî niha de nişaneyê lêzanî û pêşdîtina avakerên partiya pêşeng ya gelê Kurd bû.

Çend mehan piştî avakirina partiye û bi sedema pêkhatina guhertinên bingehîn di astên hundirîn, herêmî û navneteweyî de, rêberên Partiya Demokrat li gor hewcehiyê dîrokî di 2'ê Rêbendana 1324'an a Rojî de, yekemîn Komara demokratîk a Kurd di dîroka Kurdistanê de ava kirin. Komarek demokratîk ku xewn, hêvî û xweziyên Kurdî bi rast vegeand û di heyamê nêzik bi 11 heyvan desthilata niştimanî a komarê de, azadiya raderbirîn û çapemeniyê, parastina ewlekariya neteweyî a Kurd, hildana ala sê reng ya Kurdistanê û xebat ji bo demokrasî û piştgirî û hevpewendîya gelên zulmîjêkirî û bindest yên Rojhilata Navîn kire bi usûl û pîrensîpeke neguher ya partiye û tevgera neteweyî – demokratîk a Kurdistanê û rêvîngên rêya azadiya Kurdistanê niha jî di wê çarçoveya mirovanî û demokratîk de dimeşin.

Bi hiloşandina Komara canemerg ya Kurdistanê û lidarvakirina Serok Komarê wê, Partiya Demokrat ya Kurdistanê û tevgera neteweyî – demokratîk a

Kurdistanê kete ser durêya çokdadan û berxwedanê. Rêvîngên wefadar û biemeg yên Pêşewa bi rûmet û serfirazî ve rêya berxwedaniyê dane ber xwe û di hemû wî yam de heta niha, her demekê pêwîst bûye ji bo bilind ragirtina alaya demokratîk ji pêşkêşkirina canê xwe dirêxî û kêmasî nekirine. Lewra em mêze dikin di rewşeke wilo de ku rejîma Mihemed Riza Şah, Îran weke girava aram û rejîma xwe a dîktator bi Jandarmê Xelîca Fars dihesiband, xebatkarên serhildana bi şan û şeref a salên 46-47'an ya Rojî, xew ji çavê dîktatoriya Paşatiyê perand û ew rastî seliman ku dîktatorî û serberedayî Kelek sist û lerizî ye û li hember ruhiya şoreşvanî de tê lerizîn. Lewra rejîmê hemû şiyar û karîna xwe bona serkuttirina xebatkarên Kurd bikar anî û xwîna rêberên wê serhildanê rêt û bi sedan kes ji endamên nepenî yên partiye li bajar û gundên Kurdistanê xistin girtîxaneyên xwe ên reş û bixof de.

Di wan salên giran û dijwar de, rêberê navdar – Dr. Ebdulrehman Qasimlo – serkêşiya xebata neteweyî-demokratîk ya Kurdistanê bidestve girt û careke din asoya xebata neteweya me geş û ronahîr û rêvîngên rêya azadiyê berdewamtir û civatên xelkê Kurdistanê pêdagirtir hatin çeper û qada xebat û berxwedanê.

Şoreşa gelên Îranê di Rêbendana sala 1357'an de, hêviyêke nû xiste nav dilê civatên xelkê Kurdistanê, lê mixabin bidestxistiyên wê şoreşê ji hêla Melayan ve hatin talankirin û wan bi agir û hesin bersiva xwestekên aştxwazane yên Kurdan dan. Kurdistan bi awayên herî hov û dirindane kete ber êrîşa Pasdarên tarîti û nezaniyê û bi vî awayî bersiva **NA** bi daxwazên berheq ên neteweya Kurd hate dayîn. Neteweya me jî ji bo xebat û berevanî ji man û heynîna xwe, li cihê teslîmbûnê bi kevnepereştîyê rêya berxwedaniya çekdarî hilibijart û bo demekê jî rê neda ku rejîm û dar û destekên wê bi asûde û rihetî li ser axa zevtkirî a Kurdistanê bimînin.

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê, li doma xebata birûmet ya xwe de, gellek evraz û nişîv û karesat bi xwe ve dîtine, lê ewa cihê rûmet û şanaziya wê partiya pêşeng e, bêrawestîyan, mandînenasî û berdewamî di xebat û tekoşînê de ye. Bêguman terorkirina rêberên leheng yên partiya me Şehîd Dr. Ebdulrehman Qasimlo û şehîd Dr. Şerefkendî û dehan Kadroyên rêberiyê ji aliyê terofîstên rejîma mirovkuj ya Komara Îslamî ya Îranê ve, derbeyeke giran û dijwar ji bo tev rêvîngên maf û azadiyên xelkê Kurdistanê bû. Lê ji ber ku Partiya Demokrat mektebeke modern û pêşverû ji bo perwerde û elimandina Rêber, Kadro, Pêşmerge û endamên wê yên jêhatî



Birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê 25'ê Gelawêja 2007

bûye, ji destdayîna rêberên mezin, şehîdbûna hezaran Kadro û Pêşmergeyan, îdam, girtin û qirkirina sedan kes ji endamên nepenî yên partiye nekariye li ser rêya domandina xebata wê partiye astengan pêk bîne. Ewa ku di vê derbarê de jî cihê kêfxweşî û rûmetê ye, ew e ku neteweya me qedr û qîmeta rêberên xebatkar û mandînenas ên xwe dizane û fidakariyên wan ji bir nake. Daxistina dikan û bazara piraniya bajarên Kurdistanê û temirandina çirayan di şeva 22'ê Pûşpera îsal, salvegera terorkirina rêberê aştxwaz û gernas yê gelê me – nemir Dr. Ebdulrehman Qasimlo – nişaneyê wê rastiyê ne ku rêya wan rêberên mezin her kes û berdewam e û ew di biheştê bir û ramanên neteweya xwe de her zindî ne.

Hevalên rêzdar!

**Xelkê gernas û mafxwaz yê
 Kurdistanê!**

Komara Îslamî ya Îranê zevtker û bînpêkerê maf û azadiyên xelkê Kurdistanê û tev gelên bindest yên Îranê, di asta navneteweyî de, wekî rejîmeke serberedayî, qeyransaz û bînpêkerê qanûn û peymanên navneteweyî hatiye naskirin û di refa herî pêş a wan rejîman de ye ku çî cure nîrx û bihayekê bi pîrensîp û yasayên navneteweyî nade û yê bûye rejîmeke serberdayî û hewildanê berfireh bona çêkirina çekên Etomî dest pê kiriye û eşkere ye, çekdarbûna wê rejîmê bi wan çekên kavilker, dikare çî karesatekê ji bo çîhana pêşketî û mirovahiyê biafirîne.

Ew rejîme di asta herêmî de, hewildan û xebatên xwe ji bo destavêtin di nav kar û barên hundir ên welatên Rojhilata Navîn de bileztir kiriye. Li Asyaya Navîn, Efxanistan, Pakistan û Keşmîrê heta digihîje Îraq, Lubnan, Yemen, Filistin û Behreynê bi eşkere û li ber çavê xelkê çîhanê ve alîkariyê dide girûpên terofîstî. Ev kar û kiryarên rejîmî yê bûye sedema vê çendê ku welatên herêma Rojhilata Navîn bêtir ji caran seh bi tirs û xofê ji wê rejîmê bikin û bikevîne fikra çêkirina cemsêra dijberî wê rejîma dîktator.

Di asta navxweyî de jî û nemaze di wan çend mehên dawiyê de, rejîma azadîkuj a Komara Îslamî ya Îranê li seranserê Îranê bi giştî û bi taybet li Kurdistanê, serkuttirinek sîstematik yê daye destpêkirin

û di wê serkut û çewisandina dijî mirovane de, jin, mamsota (dersbêj), xwendekar, karker û rojnamevan yê kirine nişane û armanc. Xuya û aşkera ye ku ev pêla nû ya serkut û tepeskerkirin, nişaneyek ji bo herifandina rewatî û berheqîya vê rejîma serberedayî ye û sîgnalek ji bo guhertinên kûr ên siyasî di civaka Îranê de ye.

Hewwelatîyên hêja!

Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê, partiya pêşeng a tevgera neteweyî-demokratîk ya Kurdistanê, li ser vê baweriyê ye ji bo bersivdan bi wan guhertinên girîng ên hundirîn, herêmî û navneteweyî, herwiha ji bo rizgarkirina bilez a neteweyên bindest yê Îranê di bin çengê wê rejîmê de, hewce ye em di 3 waran de hewl û xebatên xwe berfireh bikin:

A) Di asta Kurdistanê de, pêwîst e partî û rêxistinên Kurdistanê zêdetir ji caran di diyalogê avaker bi merema gihîştin bi platformeke demokratîk ji bo pêşeroja Kurdistanê, bi dîr ji her terze metodeke propagandeyî beşdariyê bikin.

B) Di asta neteweyên bindest ên Îranê de, hewce ye Kongireya Neteweyên Îrana Federal çelengtir bihê kirin û bikare bi awayekî piratîkî xebata neteweyî a gelên bindest piraktîze bike û bibe sedema balkişandina navendên biryardanê û di encamê de bibe yek ji kolekeyên sereke ên bedel û alternatîva Komara Îslamî ya Îranê.

C) Di asta seranserê de, lazim e diyalog û gotûbêjê avaker di navbera hemû partî û rêxistinên siyasî ên Opozîsyona Komara Îslamî de dest pê bike û hemû bi dîr ji çarçoveya teng û bertesk ên îdeolojîkî, bona çêkirina eniyêke demokratîk ya nîştîmanê hewlan bidin û wekî bedel û alternatîva sereke ya Komara Îslamî a Îranê

ji bîr û raya giştî û cihanê re binasînin. Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê bi fermî nasîna hemû maf û azadiyên xelkê Kurdistanê û neteweyên dinê yê bindest ên Îranê ji bo pêkanîna her çiqas bileztir ya wê eniyê bi bingeh û kolekeyê qahîm dizane û ji bo tev alîkarî û hevpêwendiyêke piratîkî amade ye.

Me ji bo alîkarî û hevpêwendiyê di wan sê astan de gellek xebatên hêja meşandine û niha sûn de ji xwe di vê rêyê de bi berpirsiyar dizanin û di vê derheqê de em ji bo diyalog û gotûbêjê û guhartina bîr û rayan her destek hevkarîyê bi germî digivîşînin.

Xelkê xebatkar yê Kurdistanê!

Bi hewce dizanim di vê roja dîrokî e careke din li ser çend pîrensîpên nequher ên Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê tekezê bikim:

1. Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê di hemû astan û bi giştî di derbarê doza rewşa û berheq ya Kurd de, bawerî bi aşî û gotûbêja avaker heye û herdem xwe pêbend bi wan pîrensîpên şaristanî dizane.

2. Partiya Demokrat weke partiyeke demokratîk ya neteweyî bona gihîştin bi armancên bilind ên mirovanî û neteweyî ên xwe ji hemû awayên xebatê wekî: xebata rêxistinî, diplomatîk, ragihandin û heta xebata çekdarî weke aleva dawîn ya xebatê, di demên pêwîst de mifahê distîne.

3. Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê, gelên bindest yê Îranê bi hevalbendên stratêjîk ên xwe dizane û li ser pêwendîya kûr û berfireh a navbera wan gelên bindest tekezê dike.

4. Partiya Demokrat ya Kurdistanê, bi serxwebûna biryardanê, xweparastin ji destavêtin di nav kar û barên hundir yê hêzan û li ser rêz û hurmeta dualî û

alîkarîya dostane îsrar û tekezê dike.

5. Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê, tevî pêvajoya demokratîzasyona Rojhilata Navîn hevgav e, ji ber ku tenê cihgîrbûna demokrasiyê di wê herêmê de dikaribe azadiya gelên bindest û yek ji wan gelê Kurd ewle û garantî bike.

6. Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê bi parastina mafên mirovan pêbend dizane û xwe di eniya dijî terorîzm û kevneperestiyê de dibîne.

Di dawiyê de, bi boneya 62'hemîn salvegera damezrandina Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê ve, silavên emegdariyê ji bo hemû wan xebatkarên dişînim ku heta bo rojêkê ji bûye, di refa xebatkarên wê partiya teji rûmet û serbilindî xebitîne û xebat û tekoşîna wan yê bûye sebaba vê çendê ku partiya wan serbarê hemû pîlan û kompoyên qirêj ên dijîmin û neyaran, her wisa xweştêvî û cihê bawerî û hitbara civatên xelkê Kurdistanê bimîne. Em ji wan re dibêjin, silav ji bo fidakarî, mandîbûn û xebat û tekoşîna we.

Silav li xelkê Kurdistanê, piştevanên herdem yê Partiya Demokrat ya Kurdistanê

Silav li malbatên serfiraz ên Şehîdan û hemû girtiyên berxwedê û qehreman yê siyasî

Silav li kêmendamên partiye, şehîdên zindî ên xebatê

Silav li Pêşmergeyên çavnetirs ên gel û partiye, alahilgîrên maf û azadiyên xelkê Kurdistanê

Pîroz be 25'ê Gelawêjê, 62'hemîn salvegera damezrandina partiya pêşeng ya gelê Kurd, Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê

Peyama Hevbeş Bi Hinceta 62'mîn Salvegera Avabûna PDK Îranê

Endamên rêberîya Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê!
Kadro û Pêşmergeyên têkoşer!
Beşdarên hêja!

Hogirên ronahiya 25'ê Gelawêjê!

Bi hinceta biserdeçûna 62 salan bi ser temenê pir ji rûmet û şanazî yê PDK Îranê de, em pîrozbahîya xwe ya germ û şoreşgerane pêşkêşî hemû Kadro, Pêşmerge, endam û alîgirên PDK Îranê û malbatên serbilind ên Şehîdan, girtiyên xweragir ên siyasî û gelê Kurdistanê, piştevanên herdemî yê xebata berheq a PDK Îranê dikin.

Bêguman avabûna PDK Îranê bi serokatiya nemir Qazî Mihemed, di roja 25'ê Gelawêja 1324(1945)'an de, guhertinek bû di dîroka tevgera rizgarîxwaziya gelê Kurd bi awayekî nûjen. Herwiha nûjenkirina xwest û daxwazên biheq ên gelê Kurd û hemû tex û qatên civaka Kurdî bû li ser bingeha buhayên demokratîk ên serdem.

Dîroka pir ji rûmet û şanazî ya PDK Îranê, dîroka rikeberiyê û milmilanê tevî dîktatorî û kevneperestiyê û xebat di



Dara Natiq, Sekreterê YCDK Îranê - 25'ê Gelawêja 2007

pêxema bidestveanîna aşî, azadî, demokrasî û mafên rewşa yê gelê Kurd e.

PDK Îranê di dirêjahîya xebata xwe de tevî du rejîmên serberedayî yê Pehlewî û Komara Îslamî ya Îranê, xortên biwec û biemeg ên xwe ji dest dane û selimandîye ku rêvîngê mandînenas yê vê rêbazê û di pêxema vê rêbazê de ye. Rêberên weke

Qazî, Qasimlo û Şerefkendî, jiyana xwe feda kirin da ku bi xwîna xwe dîroka serweriyê binivîsin û ji bo keç û xortên gelê xwe waneya berxwedan û azadîxwaziye bêtînin.

Ji ber vê yekê û di vê boneya pîroz de, em Yekîtiyên Ciwanan, Jinan û Xwendekarên Demokrat ên Kurdistanê Îranê, serê rêz û hurmetê li hember hemû Şehîd û goriyên vê xebata berheq ditewînin û car din ji nû ve peymanê berdewambûnê û ranewestiyane heta serkevtinê hevdem û mil bi milê refên Pêşmergeyên Kurdistanê di çeperên xebatê de, tevî wan girê didin.

Serkeve xebata neteweyî-demokratîk a gelê Kurd bi rêberîya PDK Îranê

Neman bo rejîma paşverû ya Komara Îslamî ya Îranê

Serkeve azadî û mirovahî

Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistanê Îranê

Yekîtiya Jinên Demokrat ên Kurdistanê Îranê

Yekîtiya Xwendekarên Demokrat ên Kurdistanê Îranê

25'ê Gelawêja 1386(16.08.2007)

Peyama Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Ji Bo Kongireya Çaremîn A YCDK Îranê

Birêz Desteya Birêveber ya Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistanê

Rêzdar nûnerên Kongireya çaremîn ya YCDK Îranê!

Mêvanên hêja!

Em bona lidarxistina çaremîn Kongireya we ku nişaneyê din ji hewl û tekoşîna we ji bo pêşdebirina demokrasiyê di nava rêxistina we de ye, ke yfxweş in. Bi vê boneyê ve, em pîrozbahiyê xwe ên herî germ pêşkêşî we dikin û hêvî dikin we Kongireyê serkevtî hebe.

Gelî birêzan!

Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistanê Îranê, yek ji diyariyên neteweyî ên Komara xweştîvî ya Kurdistanê ye û xwediyê dîrokeke geş û birûmet û serbilindî ye. Di qonaxa nû ya xebatê de jî ku li pey hatin serkara rejîma Komara Îslamî a Îranê dest pê dike, Yekîtiya Ciwanan di xebata çiya û bajar de alahilgîrê xebat û berxwedaniyê li dijî çewisandin û stem û zordariya neteweyî bûye, hejmarek berbiçav ji endam û aligîrên wê rêbaza birûmet û şan û şeref canê xwe bext kirine, yan di girtîxaneyên biyom ên rejîmê de hatine hepskirin. Niha jî di çepera zanîngeh û xwendingehan heta seqam û rêgehên bajarên de em şahîdê fidakarî û çalakiya ciwanan in.

Li derve û xerîbiyê, li nav dilê Kurdistanê, li girtîxaneyan û bi giştî li her cihekê ciwanekî/ê Kurd heye, hebe, tevger û berxwedanî li dijî rejîma dijberê ciwanan ya Komara Îslamî, ber bi pêşdeçûnê de ye.

Ciwanên bihest û şoreşvan ên gelê me li derveyî welat, niha wekî hêzek çeleng û xuya di hemû warên siyasî, çandî, hunerî û xebata sîvil û medenî de bi awayekî hêja û jêhatî erkên neteweyê û welatparêzî ên xwe dimeşînin û di nava kom û komeleyên siyasî û sîvil yê navneteweyî de ê bûne zimanhalê neteweya Kurd. Her ev hewl û



tekoşîna wan ya berbiçav jî bû ku sala berê Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistanê Îranê weke endamê Rêxistina Enternasyonal Sosalîs a Ciwanan hate wergirtin û serbiliniyê din ji bo ciwanên bihest û welatparêz ên gelê me û tevgera rizgarîxwazane ya Kurd tomar kir. Em çavniheriya vê çendê dikin ku rêberiya hilbijartî a Kongireya Çarem a Yekîtiya we, zêdetir ji vê çendê hewl û bizavê bide bona ku di kom û komeleyên navneteweyî û yekîtiyên ciwanên dinê yê cihanê weke endam bihê wergirtin heta delîveya xebat û çalakiyên wê berfirehtir bibe.

Ciwanên xebatkar!

Hûn baş dizanin ku rejîma Komara Îslamî ya Îranê ku di hemû warekê ve welatê me tûşî rojreşî û xem û kovanan kiriye, ciwanên bihest û welatparêz yê me rastî kişandina madeyên bêhişker û dehan diyarde û derdên kirêt û biyom ên civakî kirine. Yan kom kom ciwanan dişîne navendên perwerdehiyê ên deste û taqimên teorîstî û wan dike goriyên siyasîyên dijî mirovî ên xwe. Di vê navberê de rewşa ciwanên Kurd li Kurdistanê Îranê ji cihên din yê Îranê xirabtir e û roj bo rojê ber bi alozî û nebaşiya bêtir diçe.

Ji bo rizgarîkirina wan ciwanan, take rê xebat û dijberî tevî rejîmê ye. Bona vê meremê hewce ye rêberiya nû ya YCDK

Îranê, her çiqas zêdetir ciwanên Kurdistanê Îranê di bin çetra xwe de kom bike heta bona vê xebat û berxwedaniyê hêz û şiyaneke bêtir bidest bixe. Di heman hal de daxwaza me ji ciwanên Kurd evayê ku tevî yekîtiya xwe, YCDK Îranê bibin û bi vî awayî hêz û şiyana û karîna xwe a takekesî bixin ser hev, heta bikaribin bi hiloşandina Komara Îslamî ya Îranê û avakirina hikûmetê nû ku hevdem vî û îradeya tev takekesî civaka Kurdewarî û nemaze ciwanan be û çî din em şahîdê vê rojreşî û bêpariya ciwanên xwe nebin.

Hevalên qedirbilind!

Bi vî awayî di vê Kongireyê de erk û wezîfeyên girîng yê ketine ser milên we ne, bi liberçavgiyê ceribîna xebat û tekoşîna we û bi taybet bûyerên piştî Kongireya sêyem, pêwîst e bi dahûrandin û şirovekirineke hûr û tevalî ji bo domandina xebat û tekoşîna pêşerojê mekanîzman diyarî bikin ku yekrêziya her çiqas bêtir ya yekîtiya we misoger bike û ew çavniherî bihê çî ku hûn û gelê Kurd meraqa wê dikim.

Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê her wekî berê digel hest bi berpîrsiyarkirinê her cure alîkarî û piştgiyê pêşkêşî Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistanê Îranê kiriye, bi taybet piştî Kongireya sêzdehem a xwe de bi kiryar meydana zêdetir ji bo kar û çelengiya ciwanan di rêvebirina kar û barên partyê de di hemû astekê de pêk aniye, niha şûn de jî careke din li ser piştvanî ji Yekîtiya we tekezê dike û bi hêviyê geş ji pêşeroja xebata we ya pîzor û rûmetdar dinêre.

Serkevtî be Kongireya Çarem ya YCDK Îranê

Bihiloşe rejîma kevneperest ya Komara Îslamî a Îranê

Serkeve xebata hevbeş a neteweyên Îranê ji bo pêkanîna Îraneke demokratîk û federal

Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê

Deftera Siyasî

04.08.2007

13.05.1386

Roja 09.08.2007'an, Kekê Cebâr Ferman endamê Mekteba Siyasî ya YNK'ê piştî çar salan berxwedanî tevî mirinê, bi sedema nexweşiyekê li bajarê Silêmaniyê wexera dawiyê kir. Bi sedema vê bûyerê, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê û Deftera Siyasî ya vê partyê, behînameyê ji birêz Celal Talebanî û Mekteba Siyasî ya YNK'ê re şandin ku em li vir deqa wan belav dikin.



Peyama Sersaxiya Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê Bi Boneya Koça Dawî Ya Kekê Cebâr Ferman

*Rêzdar Cenabê Mam Celal
Sekreterê Giştî yê YNK'ê
Silav û hurmet!*

Wexeva dawî ya Kadroyê jêhatî yê YNK'ê û endamê Mekteba Siyasî ji bo hemû ew kesên ku ji nêzik ve Kekê Cebâr nas dikirin xebereke nexweş û dilêş bû.

Bêguman ev bûyerê ji bo we yê birêz zêdetir ji tev hevalên rehmêtî Kekê Cebâr cihê kul û keserê bûye. Bi vê boneyê, em behî û sersaxiyê dibêjin we.

Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê

Sekreterê Giştî

Mistefa Hicrî

12.08.2007

Peyama Serxweşiya Deftera Siyasî Ya PDK Îranê Bi Boneya Koça Dawî Ya Kekê Cebâr Ferman

*Birêz Mekteba Siyasî ya YNK'ê
Tevî silav û rêzan!*

Xebera wexera dawî a Kekê Cebâr Ferman endamê Mekteba Siyasî ya YNK'ê ji hemûyan re cihê kul û keserê ye. Bi vê boneyê em behî û serxweşî û hevderdiya xwe pêşkêşî we birêzan dikin û ji rêya we jî hevxiyê xwe ji malbat û xizm û kes û hemû hevrêyê Kekê Cebâr re digehînin.

Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê

Deftera Siyasî

12.08.2007

21.05.1386

Di Binkeya Deftera Siyasî ya PDK Îranê De 62'emîn Salvegera Avabûna PDK Îranê Bi Coşeke Mezin Hate Pirozkirin

25 'ê Gelawêja îsal 62 sal bi ser avabûna PDK Îranê de derbas bûn. Her ji ber vê boneyê jî roja pêçsem, 25'ê Gelawêja 1386(16.08.2007)'an, bi beşdariya hejmareke berçav ji endamên rêberiyê, Kadro, Pêşmerge,

malbatên Pêşmergeyan û endam û alîgirên PDK Îranê û çend şandên partiyên rê û resmeke hêja û berfireh di du beşan de di binkeya Deftera Siyasî ya PDK Îranê de birêve çû.

Di beşa yekem a rê û resmê de ji aliyê Pêşmergeyên ser bi organên Deftera Siyasî ya PDK Îranê û Yekîtiyên Jinan, Ciwanan û Xwendekarên Demokrat ên Kurdistanê ve, sirûda neteweyî ya "Ey Reqîb"ê hate xwendin û deqîqeyek bêdengî ji bo bibîranîna canê paqij yê tev Şehîdên rêya azadiya Kurd û Kurdistanê hate ragirtin.

Piştê Kawe Behramî, endamê Komîteya Navendî û berpisê Komîsyona Siyasî-Leşkerî ya PDK Îranê, raporek li ser çawaniya birêveçûna meşq û "rêje"ên birêveçûyî bi hinceta 25'ê Gelawêjê pêşkêş kir.

Di doma beşa yekem a vê rê û resmê de Pêşmergeyên ser bi organên Deftera Siyasî ya PDK Îranê û Yekîtiyên Jinan, Ciwanan û Xwendekarên Demokrat ên Kurdistanê ve, bi çûna "rêjê" li hember endamên rêberiya PDK Îranê û beşdarên rê û resmê, pêşwazî ji 25' Gelawêjê kirin.

Para dawiyê ya beşa yekem nişandana çend dîmenên hêja û balkêş ji aliyê werzişvanên ciwan en di nava refên Pêşmergeyên PDK Îranê de bû.

Beşa duyem a rê û resmê di hola giştî ya rê û resman de bi xwendina sirûda nrteweyî ya "Ey Reqîb"ê û ragirtina deqîqeyakê bêdengiyê ji bo bibîranîna canê paqij yê Şehîdên rêya azadiyê dest pê bû. Piştê Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, rêz ji 9 jinan girt ku ji bo pêşwazîya 62'emîn salvegera avabûna PDK Îranê li Navenda 1'ê ya Kurdistanê heta cihê rê û resmê bi pêyan hatibûn.

Di aliyê din a vê beşa rê û resmê de birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, peyamek bi hinceta salvegera avabûna PDK Îranê pêşkêş kir. Birêz Hicrî, di peyama xwe de bal kişande ser şanaziyên Partiya Demokrat a Kurdistanê weke avakirina Komara Kurdistanê û soreşa çekdarî ya salên 1346 – 1347'an ên Rojî û her wiha rolê Dr. Qasimloyê nemir, di vejandina PDK Îranê de.

Di doma rê û resmê de peyama hevbeş a Yekîtiyên Jinan, Ciwanan û Xwendekarên Demokrat ên Kurdistanê ve, hate pêşkêşkirin.

Aliyên din ên vê beşa rê û resmê bi çend sirûdan ji aliyê koma YJDK Îranê û zarokên Azadiyê û her wiha dengê xweş yê Hunermendên dengxweş Samrend Elyasî, Bêhrûz Lutfî û Ziyab Sadiqî û pêşkêşkirina çend gerr ji govendên Kurdî ji aliyê koma govendê ya **Şeva Yelda**, hatibûn xemilandin.

Di dawîya rê û resmê de berpirsê Komîteya PDK Îranê ya Hewlêrê Rehîm Hebîbzade, destegulek pêşkêşî Sekreterê Giştî yê PDK Îranê kir û rê û resm di nava xweşî û gerrên govenda beşdaran de bi dawî hat.



PDK Îranê û Hewildan Ji Bo Pêkanîna Hevalbendiyê

Têmur Mistefayî
Wergeran/ Omid Esxeran

Rejîmên şovînist û pawanxwaz ên li pey hev di Îranê de li ciyê

çareserkirina pîrsa neteweyên Îranê û dabînkirina demokrasî û mafê hevvelatîbûnê di wî welatî de, siyaseta tepeserkirin, haşakirin ji hebûna neteweyên Îranê û tund û tûjî bikar anîn/tînin û tu demekê li hizra berjewendiyên dirêjheyam ên Îranê û gelên wê nebûn/nînin, belku zêdetir di hizra sepandina bîra şovînistî a xwe de bûn/ne û her hewl û gawek di pêxema demokrasî û azadiyê de bi tund û tûjî, haşa jêkirin, hela welayên piropagendeyî û şantaj li dijî gelên azadîxwaz ên Îranê bersivandiye.

PDK Îranê weke partiyeke resen li destpêka pêkhatina xwe û di yekem daxuyaniya xwe de li ser demokrasî û mafê neteweyî û hevalbendî tevî gelên din ên Îranê bîrsrar bûye, lewra ketiye ber êrîşa şovînzîma Îranî û rojek bi cudahîxwaz, rojek bi dijî şoreş û rojek kafir û ... hatiye tawanbarkirin. Lê PDK Îranê di heyama 62 sal xebata xwe de bi kiryar ev lênihêrîna şovînistî û kevneperestane bi direw xistiye û niha jî piştî 62 salan serbilind li hember êrîşa dagirkeran de sekinî ye û tu yek ji van tawanan nekariye vê partiye ji rêya rastîna wê ku xebat ji bo avakirina sistemeke demokratîk a rastîn e, dilsar bike.

Partiya me gellek bi başî ji vê rastiyê têgihîştîye ku xebata mafxwazane a gelê Kurd di Kurdistanê Îranê li dijî rejîmê tenê dikare vê rejîmê qels û lawaz yan paşdekişyanê pê bide kirinê, di baştîrîn demê de dikare rejîmê ber bi hiloşîn û jinavçûnê bibe û tu demekê bi tenê nikare û şiyana vê çendê tune ye ku bibe alternatîva rejîmê û bi vî awayî û li gor bawerî bi ploralîzmê, partiya me berdeyam hewl bona peydakirina hevalbendên din ji beşên di ên Îranê daye û ji bo vê armançê jî her ji destpêka avabûna partiye ve, vê partiye hewleke zaf ji bo pêkanîna eniyeye berfireh û bihêz ji kesayeti û rêxistinên demokrat daye û ev xebate heya niha jî her berdeyam e û ji bo selimandina vê rastiyê jî ez dê qala beşek ji wan hewl û xebatên ku partiye di heyama 62 salan xebata xwe de dayîne, bikim.

Di heyamê şerê duyem ê cîhanî de û piştî jinavçûna dîktatoriya Riza Xan, derfeteke baş di herêma de hate holê ku avabûna hinek partiyan di seranserê welat de jê ket. Di sala 1324(1945)an de, piştî damezrandina partiye û ragihandina bernameya wê ku ji 8 xalan pêk hatibû, di du xalên vê bernameyê de qala demokrasî û hevalbendiyê tê kirin, PDK Îranê jî vê rewş û zirûfê mifahê distîne û dest davêje avakirina Komara Kurdistanê, PDK Îranê her ji destpêkê de digihîje vê rastiyê ku bi bê hebûna hevalbendiyeye demokrat û bihêz, parastina wan destkevtan ne hêsan



PDK Îranê xwe bi hevalbendê neteweyên Îranê dizane

e, lewra li du warên:

1- Di warê seranserî de tevî partiya Cengel, Partiya Tûde, Partiya Demokrat a Îranê û Partiya Sosyalîst (FIRQE) eniyeye seranserî pêk tîne û li gor vê lihevhatinê, li dema êrîşa kevneperestiyê bo ser her yek ji wan hewce ye hemû bi hev re berevaniyê jê bikin.

2- Di warê neteweyî de jî tevî hikûmeta neteweyî a Azerbaycanê lihevhatinekê wajo dike. Di wê hevpeymaniyê de tevî birêvebirina kar û barên xwe li ser bingeha vê hevhatinê, xaleke din jî vê hevalbendiyê piştevanîkirin ji hev li dema êrîşa dujmin bo ser her yek ji wan e.

Mixabin him Komara Kurdistanê û him jî Hikûmeta Neteweyî a Azerbaycanê hilweşiyar û di vê nivîsarê de em nikarin qala sedemên jinavçûna wan bikin. Eva yekem xebata partiye ji bo hevalbendiyê bû.

Di roja 11'ê Reşemeya 1357(02.03.1979)an de ku roja ragihandina xebata eşkere ya partiye ye û di gellek boneyên din ên cur bi cur de, partiya me bangewaz ji bo pêkanîna eniya hevbeş ji bo hiloşandina rejîmên dîktator û anîne ser kar a rejîmek demokratîk, daye. Piştî 30'ê Cozerdana 1360'an, dema ku Mucahidîn ji Îranê hatin der û tevî Benî Sedr "Şorayê Milî Muqawimet"(Konseya Neteweyî ya Berxwedanê) pêk anîn, PDK Îranê jî bo bihêzkerin û demokratîzekirina vê Konseyê di pêxema hiloşina rejîma Komara Îslamî û avakirina rejîmeke demokratîk, daxwaza endambûnê di vê civatê de kir û bû endamê wê û heya dema ku di wê Konseyê de bû, di pêxema berfirehtîrkirin û demokratîzekirina wê civatê de xebitî, lê dema ku zanî hewlên wê nagihîjin tu encamêkê, jî wê konseyê hate der.

Di sala 1363(1984)an, liv û lebatek ji bo zindîkirina Firqeya Demokrat a Azerbaycanê li ser bingeha nû û serbixwe di partiya Tûde de dest pê bû, partiya me bi têgihîştin ji rolê bibandor ê gelê Azerî di xebata seranserî a neteweyên Îranê de û vê rastiyê ku hebûna rêxistineke serbixwe a Azerî di xurtkirin û jordebirina hesta neteweyî a gelê Azerbaycanê de bandoreke berbiçav heye, piştevanî ji wê hewlê kir û ji bo bi encam gihîştina wê xebatê xebateke zaf meşand, lê mixabin ew tekoşîne negihîşte encamê.

Piştî van xebatan û dubare û çendbare hewildanê, pêkanîna eniyeye demokrat a seranserî weke erkeki dîrokî di bernameya karê partiye de bûye, bo mînak di

xala 12'an ya bernameya kongireya 8'em de hatiye: "Pêkanîna eniyeye demokrat erkeki dîrokî ye, lewra xebata heya niha a partiye di pêxema pêkanîna eniyê de tê pesendkirin û domandina van hewlê di pêşerojê de bi hewce tê zanîn".

Di Kongireya 13'hem de jî rêberiya hilbijartî tevî bi girîngzanî û hewldan ji bo pêkanîna hevalbendiyê li du warên:

1- Hevpeymaniya Neteweyên Îranê ku her piştî Kongirê ji bo çibçîkirina vî erki hewl û xebat dest pê bû ku bi xweşî ve di heyameke kurt de me karî bi hevkarîya rêxistinên din ên neteweyên Îranê, **Kongireya Neteweyên Îrana Federal** ava bikin ku heya niha hejmara partî û rêxistinên ku di vê Kongireyê de endam in, gihîştîye 16 rêxistin û roj li pey rojê hejmara wan endamên wê zêdetir dibe, navenda wê London paytexta welatê Bîrîtaniyayê ye û di çend welatên Ewropa û Amerîkayê de tayên xwe ava kirine û hêdî hêdî dibe ciyê baweriya gelên bindest ên Îranê û navendên biryarder.

2- Xebat tevî rêxistinên seranserî ên opozîsyona navxwe û derve ji bo pêkanîna hevalbendiyeye seranserî, di vê derheqê de zêdetir ji 2 salan e nûnerên partiya me di civînên Paltakî de ku bi armanca jilhev nêzîkkirina bîr û rayên opozîsyonê tîrî lidarxistin, beşdar dibin û roleke berbiçav dilîzin. Hewla dawîn di vê derheqê de, beşdarîkirin bû di konferansa hevpewendiyê ku bi beşdariya hejmareke zaf ji rêxistinên Opozîsyonê li Parîsê hate lidarxistin.

Ji bilî vana, partiya me di hevalbendiyeye din tevî çend rêxistinên Çep ên Îranî ji bo ragihandina daxuyaniyên hevbeş endam e.

Bêguman hewl û xebatên partiye di pêxema yekxistina Opozîsyona Îranî di pêxema Hiloşina rejîma serberedayî a Komara Îslamî û avakirina rejîmeke demokrat û federal de her berdeyam be û ji bo vê armançê hemû hêz û karîna xwe ya madî û menewî dê bikar bîne.

Heke di asta seranserî de ji bo pêkanîna eniyê me xebat kiriye bêşik û guman em pêkanîna enî yan awayek ji

Daxuyaniya hevbeş:

“Em Êrîşa Terorîstî Ya Devera Şengalê Şermezar Dikin”

Ê varia roja sêşem, 14'ê Tebaxa 2007'an, di encama çend teqînên rêzokî yên xurt de li gundên Tel Uzêr û Şêx Xidir ên qezaya Şêxan ya Başûrê Kurdistanê, zêdetir ji 500 kes ji Kurdên Êzidî ên wê deverê şehîd û birîndar bûn û her wiha zîyan û xisareke berfireh a madî jê çêbû. Her di wê deverê de berê jî di meha Nîsanê de, 23 kes ji birayên me yên Êzidî ji aliyê terorîstan ve bi awayekî bikom hatin kuştin.

Ev êrîşên terorîstî yên ku li herêmên Êzidî akincî yên Başûrê Kurdistanê diqewimin, ji bilî wan armancên giştî ku terorîst li Îraq û Başûrê Kurdistanê de dişopînin, xwediyê armancên taybet û diyarîkirî ên xwe ne. Bi gotineke din ev êrîşene bi armanca jînosayda Kurd û asîmîlekîrîna nejadî û bi merema derkirina keç û xortên resen ên neteweya Kurd li ser axa bav û kalên me dimeşe.

Şik û guman di vê çendê de tune ye ku diyarîkirina wan armancên dijî Kurd û roganîzekîrîna wan tawanên mezin, bi piştgirî û xerca dewletên dagirker ên Kurdistanê û dijminên maf û azadiyên neteweya Kurd e.

Kuştin û terorîkirina tak û bikom a keç û xortên gelê me di herêmên veqetiyayî ên Başûrê Kurdistanê, zêdetir ji her demekê, hewceyî lezkirîna di veqetandina wan deverane bo bin desthilatdariya Hikûmeta Herêma Kurdistanê û tekezîkirîna li ser çibîckirîna madeya 140'ê ya Destûra Herdemî ya dewleta Îraqa Federal derdixe



holê. Her wiha ji bo betalkirina pîlan û komployên dijminên Kurd û Kurdistanê û kurtkirina destê reş yê terorîstan û parastina wan deverane bi giştî û nemaze deverên xwişk û birayên me yên Êzidî, pêwîstî bi gav û biryarên lezgîn li Serokatî û Hikûmeta Herêma Kurdistanê heye.

Em ev 12 partiyên Kurdî û Kurdistanî yên wajokerên vê daxuyaniyê, gellek bi tundî komkujiya li dijî xwişka û birayên xwe ên Êzidî, ev keç û xortên resen yên neteweya Kurd, mehkûm û şermezar dikin, di xema Şehîd û birîndarên goriyên vê tawana rêzokî de xwe bi şîrîk û hevhemê malbat û kes û karên wan dizanin û di kûrahiya dil de behî û sersaxiyê pêşkêşî wan dikin. Di heman demê de jî em ji bo listûgirtina her erk û wezîfeyekê ku ji xem û xisarên wê bûyerê kêmtir bike, amadebûna xwe îlan dikin.

16.08.2007

- **Partiya Demokrat a Kurdistan a Îranê**
- **Saziya Xebat a Kurdistan a Îranê**
- **Partiya Sosyalîst a Kurdistanê – PSK**
- **Rêkewtina Demokratîk ya Kurd li Sûriyê – Wifaq**
- **Partiya Demokrat ya Kurdistanê – PDK Bakûr**
- **Partiya Pêşverû ya Demokrat a Kurd li Sûriyê**
- **Partiya Yekîtiya Kurd li Sûriyê**
- **Partiya Azadiya Kurd li Sûriyê**
- **Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê – El Partî**
- **Partiya Welatparêzên Demokrat ên Kurdistanê - PWD**
- **Partiya Demokrat a Kurd li Sûriyê**
- **Partiya Azadiya Kurdistanê - PAK**

Di Rê û Resmekê De Li Şeqlava, Cejna 25'ê Gelawêjê Hate Pîrozkirin

R oja çarşem, 17.05.1386 (08.08.2007)'an, bi merema rêzgirtinê ji 25'ê Gelawêjê, 62'emîn salvegera avabûna PDK Îranê,

endamên PDK Îranê yên ser bi Komîteyên Hewlêr û Soranê, rê û resmek lidarxistin.

Rê û resm seet 18'ê piştî nîvro li seyrangeha Dêrîn a nêzik bajarê Şeqlava, bi sirûda neteweyî ya “Ey Reqîb”ê û ragirtina deqîqeyekê bêdengiyê ji bo bîranîna canê paqij ê Şehîdên rêya azadiyê, dest pê bû.

Piştîre Luqman Mêhfer, endamê Komîteya Navndî ya PDK Îranê, bi nûneriya Defetra Siyasî çend gotinek pêşkêş kirin.

Birêz Mêhfer, di axavtinên xwe de bal kişande ser rewş û zirûfa avabûna PDK Îranê, rolê berçav ê Pêşewayê nemir Qazî Mihemed di avakirina PDK Îranê de û rêz ji xebat û tekoşîna gelê Kurdistanê girt ku ji bo piştevanîyê ji rêbaza rastîn a Şehîdên mezin Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî, hemû şiyana xwe xistine xizmeta armancên PDK Îranê.

Di doma rê û resmê de peyama Komîteyên Hewlêr û Soranê ji aliyê xatûna Beyan Gulmihemedî ve, hatin pêşkêşkirin.

Piştîre peyamên Partiya Azadiya Kurdistanê (PAK) û Partiya Rizgariya Kurdistanê, ji aliyê nûnerên wan ve, hatin



pêşkêşkirin.

Di pareke din a rê û resmê de Rehîm Reşîdî, çend gotinek derheq 62'emîn salvegera avabûna PDK Îranê, pêşkêş kirin.

Aliyên din ên rê û resmê bi dengê Koma Sirûdan a Navenda 3'ê ya Kurdistanê û stranên hunermendên dengxweş Bêhrûz Lutfî, Ziyad Sadiqî û Tîrêj, hatibûn xemilandin.



PDK Îranê

Serxwebûna Siyasî û Biryardanê

Hesen Şerefi
Wergêran/ Hemîd Muxtarî

Yek ji sebebên herî sereke ên man û berdewambûna her partî û rêxistineke siyasî li doma xebata xwe de, serxwebûna siyasî û biryardana wê partî û sazîyê û cihgîrbûn û parastina wê pîrensîpê ye. Eva jî nahê vê wateyê ku ew partî û sazîya xwe di çarçoveyê teng de ragire û deriyên li ser xwe girê bide û xwe ji her terze pêwendigirtinek û pêkanîna dostîniyê dûr bigre û bi terzekê xwe rê bixe ku ne tevî tu kesê/î rêk bihê û ne tu kesek bikare tevî wê rêk were. Ji ber ku wê demê serxwebûna siyasî wateya xwe ji dest dide û tu kes û aliyek tune ye ku ev partî yan sazî serxwebûna siyasî û biryardanê a xwe li hember de biparêze. Belkî parastina serxwebûna siyasî û biryardanê wê demê wateya xwe ya rastîn dide û bandorê li ser xurtbûna tekoşîn û jordecûna pirrestîj û baweriya wê partî yan sazîyê didanê ku bikare di qada siyasî û pêkanîna têkiliyan de û xurtkirina pêwendiyên xwe de warê hewce bona ber bi pêşvebirina tekoşîn û gihîştina bi armancên xwe pêk bîne û cehd û tekoşînan bike, bê ewê ku bona gehîştina bi armanca han û di pêvajoya têkiliyên xwe de rê bide ku kesek an aliyek bandorê li ser siyaseta serxwebûna biryardanê danê.

Di pêvajoya dîroka wan çend salên borî de, gellek partî û rêxistinên cur bi cur hebûne ku heyamekê jî bandora xwe hebûne, lê bi sebebê vê ku stûxwarê welat û desthilatê bûne, yan jî ketin bo bin bandora partî û rêxistineke din bi ser xwe de qebûl kirine, hêdî hêdî hatine mehkîrin, yan jî jinav çûne û bêhitbar mane. Yê wîha jî hebûn ku li her zirûfekê û li jêr her zext û givaşekê de li ser siyaseta xwe û serxwebûna xwe ya siyasî û biryardana xwe de mîcid û pêdagir bûne, lewma hem ketine nava dilê xelkê xwe de û ji aliyê gellek partî û sazîyên din û ji aliyê zaf welat û sazîyên navneteweyî bûne xwediyê pirrestîj û baweriyeke berçav û herwiha gişt alî li ser têkiliyên xwe tevî partî û sazîyên han û li ser soz û biryarên wan hesabê dikin.

PDK Îranê, ji wê dema ku Dr. Qasimloyê nemir rêberiya wê girte stûyê xwe û têkiliyên vê partiyê li ser bingeha serxwebûna siyasî û biryardanê de xurt kir û esla serxwebûn û serxwebûna siyasî û biryardanê di partiyê de bi tevahî û bi xurtî cihgir kir û kire eseleke neguher, bû partiyek ku hem hemû Kurd rûmet û şanazîyê pê bike û hem di asta navneteweyî de girîngiyeke taybetî pê were dan û kariye bandora xwe li ser pêvajoya bûyerên Îranê bi giştî û nemaze Kurdistanê

çê bike. Ew siyaseta serxwebûn û serxwebûna siyasî û biryardana PDK Îranê, wiha kiriye ku qazanc û berjewendiyên xelkê Îranê qet ji aliyê vê partiyê nehê jibîrkirin yan kêmrang nebe û weke hindêk partî û aliyên din nebe goriyê siyaseta welat û desthilatê û partî û sazîyên din yan berjewendiyên wan di Îran û Kurdîstanê Îranê de.

Serxwebûna siyasî û biryardana PDK Îranê, îzin da vê partiyê ku di tu rewş û hewayekê de neçe bin bandor û rikêfa derewîn a siyasî û dirûşm û stiratêjiyan û helwest û biryardana xwe, tenê û tenê bi şîrove û berhevdana xwe diyarî bike, lewra heke mirov lênihêrîneke kurt li ser helwest û biryarên vê partiyê hebe, jêre eyan dibe ku ev siyaseta serxwebûn û biryardanê çî

“Serxwebûna siyasî û biryardanê pîrensîpek e ku PDK Îranê pê tê naskirin û sedemek bûye ku ev partiye di çepera xebat û tekoşînê de her berdewam bimîne”

xwesnavî û hitbarek ji bo vê partiyê bi diyarî aniye.

Dema ku rejîma Paşayetiye di Îranê de hiloşiya û bizava gelên Îranê serket, di demekê de ku rê ji bo girtina desthilatê ji aliyê rejîma Îslamî di Îranê de di hate xweşkirin, hejmarek ji partî û sazîyên siyasî piştevanî jî girtina desthilatê ji aliyê rejîma Îslamî ya Îranê dikirin û bona wê armancê di refrandoma diyarîkirina vê rejîmê de beşdarî kirin û dengê erênî dane Komara Îslamî ya Îranê. PDK Îranê berevajî rewşa heya ya wê demê, di refrandomê de beşdarî nekir, ji ber ku: yekem; ji aliyê refrandoma han bi nedemokratîk dizanî, çimku rê nedida xincî hilbijartina di nava rejîma berê û rejîma Komara Îslamî, hilbijartineke din hebe. Lewra eşkere bû xelkê ku rejîma berê dinasî û Komara Îslamî jî neceribandibûn, encama dengdanê bi serkevtina rejîma Komara Îslamî bi dawî dihat. Ya duyem eva bû ku dizanî di rejîmeke îdeolojîk ya siyasî de demokrasî û mafê neteweyî yê gelê Kurd misoger nabe.

Beşdarî nekirina han jî ku ji siyaseta rast û serxwebûna siyasî ya PDK Îranê çavkanî digirt, di keş û hewayê wê demê de bû

sebebê xistina givaşeke zaf li ser vê Partiyê û gellek buxtan lê hatne kirin, lê îro rojê rastiyên heyî bi wê terzê ku bo PDK Îranê eşkere bibûn, bo gelên din yê Îranê jî eşkere bûye û helwesta rast û serxwebûna PDK Îranê weke şanazîyê bo vê partiyê dizanin û rêz û hurmetê jêre digirin.

Yan dema ku di destpêka serkevtina şoreşa gelên Îranê ku êriş li ser balyozxaneya welatê Amerîkayê li Teheranê de hate kirin û weke *şoreşa duyem* hate binavkirin, PDK Îranê rast di nava rewş û zirûfa wî çaxî de, tenê ji ber vê çendê ku karê han berevajiyê urf û azînen diplomatik û dîr ji têkiliyên welatan dizanî, mehkûm kir ku di encamê de barana buxtanan li ser de barî, lê niha ew helwesta PDK Îranê bi rêz û hurmet ve tê mêzêkirin û heta ew kesên ku birêveberên wî karî bûn, niha ji kiryara xwe poşman in û şaşbûna biryara xwe a wê demê dipejirînin.

Diyare siyaseta serxwebûn û serxwebûna siyasî û biryardanê jî, hewcehî bi netirsî û dilêriya şoreşvanî heye ku heke PDK Îranê ne xwediyê wan taybetmendiyên ba, nedikarî bi rehetî, berevajî zirûfa wê demê helwestê bigire û biryarê bide ku li dema biryardanê û helwestgirtina PDK Îranê li ser Îranê de hatibû sepanandin.

Şik di vê çendê tune ye ku pîrr caran parastina serxwebûna siyasî bo PDK Îranê hem di Îranê û li deverê de, jêre gellek giran xilas bûye, lê partiya han qet rê neda ye ku serxwebûna siyasî û biryardanê, wê bikeve bin pirsîyarê û her wê yekê PDK Îranê kiriye xwediyê ew bawerî û xweşteviya ku îroj di nava xelkê Kurdîstanê, Îranê, deverê û kom û komeleyên navneteweyî de heye.

Parastina serxwebûna siyasî û biryardanê ji bo PDK Îranê weke pîrensîpeke here girîng û seba man û xweştevbûna vê partiyê li dirêjahiya xebata wê bûye û baweriya qahîm a birêveber û endamên partiyê bi vê pîrensîpê, garantî û zaminê parastin û heta cihgirtirîna vê partiyê ye.

Eşkere ye ku PDK Îranê di zirûfekê de heya wê qasê li ser parastina serxwebûna siyasî û biryardana xwe mîcid bûye ku pêwendiyên herî xurt û berfireh tevî cîhana derve hebû ye û her pêka pîrensîpa serxwebûna siyasî a xwe tevî wê çendê ku rêz û hurmetê ji bo gişt aliyên ku bi wan re têkilî heye, ne cehd kiriye ku serxwebûna aliyên hember bixe bin pirsîyarê û ne rê daye tu kes û aliyekê ku heta bîra binpêkirina ev esla girîng û ev pîrensîpa girîng a PDK Îranê bikin.

Lewra esla serxwebûna siyasî û biryardanê bûye pîrensîpeke wiha ku PDK Îranê pê tê naskirin û weke taybetmendiyê herî berçav ya vê partiyê tê mêzêkirin. Loma em dikarin bibêjin ku hemû ew pîrestîj û herwiha bawerî û xweştevbûn û di rastî de mana PDK Îranê, girêdayî ye bi parastina herdemî ya vê pîrensîpê. Parastina wan taybetmendiyên han jî seba xurtbûn û bawerî û xweştevbûna PDK Îranê di nava xelkê de ye.

ZINARA EREBÎ .. HEVGIRTINA NIŞTIMANÎ LI SÛRIYÊ DI BER HERIFÎNÊ De

Ji dema ku neteweya Kurd li gor Peymana Saykis-Pîko a sala 1916'an, hatiye girêdan bi dewleta Sûriyê ve ji

wê demê ve xebata xwe berdewam dike ji bo parastina nasnameya xwe ya netewî û ji bo ku ciyê xwe yê durust di hundurê welêt de, di bin siya sazûmanek demokratî û nûjen de bigire, da ku mafên xwe yê netewî bide parastin.

Bi rastî jî miletê Kurd rojek giring di avakirina dewleta Sûriyê de listiyê ku di bin nîrê Fransiyayê de bû. Li seranserê nîva pêşî ji sedsala bîstan qurbanîyên hêja pêşkêş kirine ji bo pêkanîna azadî û serxwebûn û pêşketina Sûriyê, lê mixabin hêzên şovîni jî vê rolê nerazî bûn û hêdî hêdî piropoganda û derew li dor vê rolê belav kirin. Gotin ku Kurd xeterekê li ser ewlekariya welat çê dikin û nerînên tijî kî û zikreşî li dijî Kurdan dane eşkerekirin û belavkirin û hebûn û taybetmendiyên wî yê netewî dane înkarkirin û ev mêjiyê nijadperest hate eşkerekirin. Yekemîn car di destûra Partiya BEES de ku eşkere dibêje: "çi kesê/a ku bi zimanê Erebî biaxive, ew dibe Ereb û çi kesê/a li derveyî vê nerînê bimîne, divê were koçbarkirin û dûrxistin.."

Ev piropoganda şovîni li dijî neteweya Kurd li Sûriyê û li dijî rola wî ya niştimanî ya birûmet gihîste wata herî bilin. Di salên şêstî ji sedsala bîstan de, dema ku efsêrê ewlekariyê Mihemed Teleb Hilal, serokê beşa siyasî li parêzgeha Heskê (Cezîrê) lêkolînek xerab amade kir li ser Cezîrê ji aliyên netewî, siyasî û civakî ve, kî û berberî jê difûriya li dijî kurd. Bi wê nerînê dixwest dîwarekê ji xelkên

Ereb ava bike, di navbera xelkên neteweya Kurd de yê ku sînorên (Saykis -Pîko) berê ew ji hev qetandibûn, û wan ji herêmên wan yê resen bidin koçbarkirin û Ereban li şûna wan cîbicî bikin. Ji bo ku demografiya wan herêmên ku bi piraniya xwe ve Kurd in, bidin guhertin, û di wê lêkolîne de dabû nîşandan ku kurd dixwazin welatê Sûriyê bidin parçekirin û dewleta Îsraîl ya duyemîn bidin çêkirin û bêbextî û derwên din jî digotin, ji bo gurkirina cemawerên Ereb li dijî birayên wan yê Kurd ew ji aliyekî ve û ji aliyê din ve peydakirina behana ji desthilatên şovîni re ku êrişan bidne ser wê xeter a ku di mêjiyê xwe de çê kirine ji bo qirkirina Kurdan. Bi rastî jî wî efsêrê şovîni çend pêşniyarên mîna jehrê ji serokatiya dewleta xwe re pêşkêş kiribû ku bi pêkanîna wan pêşniyaran dê bikaribin Kurdan ji kok de rakin, wî di wê lêkolîna xwe de di vê derbarê de ev gotiye: "pîrsgirêka kurdî îro ku xwe saz kiriye, wek nexweşiya penceşêrê ye, çê bûye yan hatiye çêkirin di parçekî de ji laşê neteweya Erebî de û tu derman jêre tune ye ji bilî jêkirinê pêve".

Ji nav pêşniyarên ku Mihemed Teleb Hilal pêşkêşî serokatiya xwe kiriye ev xala (8) ye ku dibêje: bicîkirina xelkên Ereb yê netewperest di herêmên Kurdî de li ser sînor, ji ber ku ewê bibin dîwarek di pêşerojê de di navbera kurdan de û wisa jî dê bibin çavdêr ji

li ser wan, ta ku werin barkirin bi yek carê re ..".

Mixabin ew pêşniyarên kirêt û rûş jî aliyê desthilatên şovîni ve wek piropogama kar hatin qebûlkirin û li ser erdê bikar anîn. Di riya zincîrekî ji pirojeyên şovîni û siyasîtên dijî maf û yasayên lîsta mafê mirovan û peymanên navdewletî ku ji aliyê dewleta Sûriyê ve jî hatine îztekirin û hejmartina awarteya 1962 û zinara erebî xirabtirîn piroje bûn ji wê lîstê û mezintirîn zerer gihandin nasnama netewî ya neteweya Kurd ..

lewma zinara Erebî yek ji pêşniyarên Mihemed Teleb Hilal bû ku desthilatên Sûriyê di 1966'an de dest bi cîbicîkirina vê pirojeyê kiribûn wek qonaxa yekem, ku dest danî bûn ser baştirîn zeviyên çandiniyê li Cezîrê yê ku cotkarên Kurd ji bav û kalan ve bi xwêdana xwe av dida û cot dikir, li seranserê sînorê Sûriyê bi sînorê Turk û Îraqê re, ew zinar dest pê dike. Ji Eyindîwar li ser çemê Dicle ta bigihe Serê Kaniyê ji aliyê rojava ve , bi ferehbûna 10-15 kîlometir û bi dirêjaya 375 kîlometir, ev zevî û qad ji cotkarên Kurd hatin sitandin bi behana avakirina komelgehên çandiniyê li gor nimûnên Sovxoz û Kolxoz ên sovîyetî ku leşkergehê sosyalîstî piropogandek mezin jêre kiribû û bi xurtî li kêlekê disekinî, li dijî cotkarên Kurd ku vê zinara Erebî ew bê

qada hiştibûn û wê demê Almaniya Rohilat ew cotkar wek kevneperest û nokerên sehyûnizmê didan nîşandan, ji ber ku li gor dîtina wan li dijî guhertinên sosyalîstî di Sûriyê de disekin.

Li ser bingeha biryara serokatiya Bees (Qiyada Qitrî), ya di bin hejmara 521 / 24-6-1974, desthilata Sûriyê di sala 1974'an de

dest bi pêkanîna qonaxa duyem ji Zinara Erebî kir bi anîna 4500 malên Ereb ji derveyî parêzgeha Cezîrî, ji parêzgeha Heleb, Reqa ew anîn û li 39 gundên nûjen ku dewletê ji wan re ava kiribûn, di seranserê wê zinara erebî de, ew bicî kirin û ew zevî li wan belav kir ku hejmara wê digihîste 800 000 donim, yanî her malek Ereb ji 150-300 donimî zêdetir sitand û hemû pêwîstiyên jiyanî ji wan re berdest kirin di wan gundan de.

Ev piroje hîn jî berdewam û bêrawestan ta roja îro jî didome û vê dawiyê desthilata Sûriyê dest bi pêkanîna biryarekê kiriye ku 150 malên Ereb ji başûrê bajarê Heskê ji navçeyên Şedadê û çiyayê Ebdul Ezîz bînin herêma kurdî Dêrikê wan bi cî bikin û zeviyên mayî ku berê ji kurdan sitandibûn li wan Ereban belav bikin. Di demekê de ku bi dehan hezar malên Kurd xwediyên wan zeviyan hene ku ji bostek erd jî bêparin û ev gava şovîni hatiye avêtin li ser bingeha nama ku ji Wezarata Çandini û sazîkirina çandiniyê derketiye di bin hejmara 1682 / m d / 3-2-2007 ya Qiyada Qitrî ya Partiya Bees. Li gor vê biryarê di 13.6.2007'an de rêvebira çandini û sazîkirina çandiniyê li Heskê 5600 donim zevî ji gundên Kurdan Xirab Reşq, Girê Reş, Qidêrik, Girkê Mîro, Qizircibê dane wan malên Ereb.

Her wiha jî desthilatdarên Sûriyê her serê

demekê wan zeviyên cotkarên Kurd yê hindik ji wan distînin ku bi keda xwe û xwêdana xwe ji kevîran paqij kirine ku ji çend doniman ne zêdetir bû û dane Ereban bi behana ku erdê wan kême, weke ku di bîst salên



ELÎ ŞEMDÎN *

derbasbûyî li dehan gundên Kurdan de li herêma Dêrikê, Sermisax, Tokil, Kêşik, Dêrûnê, Cîlika, Mistefawiyê.. çê bûye, bi hêviya ku zor xurtir bibe li ser hemwelatîyên Kurd an pîrçî bikin da ku neçarî dev ji gundên xwe berdin û vala bikin li gor daxwaza M.T.Hilal.

Bi rastî ev zincîra pirojeyên şovîni ne ji valahiye hatiye ku dixwaze hebûna Kurd tune bike, lê belê ji wî mêjiyê şovîni qirêj hatiye der ku xwediyê wê Mîşêl Eflaq bû, ewê ku ramanên xwe ji Hîtler wergirtibûn, ew mejiyê ku rêjmên Sûrî û Îraqê mixabin bawerî pê anîbûn, ji ber ku pirojeyên nijadperest li herêmên Kurdî li Sûriyê û bi taybet li Cezîrê ku bûye û hîn jî dibin, ji bo erebkirina wan herêman û valakirina wan ji xelkên wan û ji bo guhertinek demografî lê bicî bînin, ev şêwe ji pirojan hatiye fotokopîkirin ji pirojeyên ku li gellek herêmên Kurdistana Îraqê hatine pêkanîn (Kerkûk, Xaneqîn, Mendelî, Şingal, Mexmûr, Zimar..), ev pîlan îro bûne astengên mezin li pêşiya avakirina sistema fedralî li Îraqê û herwiha jî bûye bombeyek (mayîn)di her demê de pirojeya siyasî bi tevayî dide herifandin û xerakirin, û baca wê jî ne tenê neteweya Kurd dê bide, lê belê Îraq bi tevayî û herêma Rohilat Navîn jî bi tevayî wê bacê bide û îro vaye cihan derbasî sedsala bîstan bûye ku gellek guhertin û bûyer û nerînên demokratî û mafên mirov bi xwe re anîne ku bûye soroşek mezin li dijî nerîn û baweriyên dîktatorî û zordest ta ku gihîste bidarvekirina Sedam Hisên ewê ku ev mejiyê qirêj bikar anîye bi şewekî kirêt û rûş gihîste bikaranîna çekên kîmyayî li dijî Kurdan. Lewma berdewamiya li ser vî mejiyê qirêj ne aqilmendiyek e, ji ber ku dem jê derbas bûye û bûye ji pêmayên kevîn, û demê da nîşandan ku ev mejî pûç e û qet bi ser nakeve, di qirkirin û qutbirîna miletekî kevîn de, ev pirojeyên ku her û her bi xerabî li xwediyên xwe vegeyirane. Ji ber ku ev piroje mîna bombeyan têne çandin di nav yekîtiya niştimanî de û her dê ew bombe rojekê biteqe, eger kesên aqilmend û hezkerên yekîtiya welat û pêşeroja wî, zû van pirojeyan pirotesto nekin û doza sekinandin û rakirina wan bi yekcarî û bê çawa zinarên xweteqîn dujmanan tenê nakuje, belam xwediyê xwe pêşî dike li gel kesên bê sûc û guneh jî (zarok, kal, jin ..), wilo jî pirojeyên şovîni van kesan tevan dide ber xwe, ji ber ku ji eynî mejî ev piroje têne der, gelo her yek ji ciyê xwe (ji hundurê desthilatê û ji derve) dê van pirojeyên kirêt pirotesto bike?? da ku yekîtiya welat biparêze ji agirê van zinarên xweteqîn ..

*- nivîskarekî kurd yê ji Sûriyê

Meşqekî Leşkerî A Kadro Û Pêşmergeyên PDK Îranê, Bi Merema Pêşwazîkirinê Ji 25'ê Gelawêjê



Bi beşdarya birêz Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî, Kawe Behramî, endamê Komîteya Navendî û Rehîm Mengurî, endamê Cîgir ê Komîteya Navendî ya PDK Îranê û her wiha bi sedan Fermander, Kadro û Pêşmergeyên organên cur bi cur ên PDK Îranê, roja îne, 19.05.1386(10.08.2007)an, meşqekî leşkerî bi merema pêşwazîkirinê ji 25'ê Gelawêjê, 62'emîn salvegera avabûna PDK Îranê, birêve çû.

Di kombûnekî giştî de Kawe Behramî, Fermanderê giştî yê meşqa han, cihê birêveçûna meşq diyar kir û erkê beşdaran destnîşan kirin. Di wî meşqî de keç û jinên Pêşmerge jî hêz û karîna xwe xistin ser hêza Pêşmergeyên din û rolek berçav girtin stû.

Di dema dawîya meşq de birêz Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, hevdem tevî derbirîna kêfxweşiya xwe, pêşwaziyekî germ ji tev beşdaran kir û di axavtinên xwe de ji bilî pîrozkirina 25'ê Gelawêjê ji Pêşmergeyên PDK Îranê û gelê Kurdistanê got: "Em hemû xwendekarê xwendîgeha 25'ê Gelawêjê ne, ji ber vê yekê ye jî ku heya niha bi hêviya rojên ronahî, ji bo bidestvehatina armancên 25'ê Gelawêjê, xebatê dikin".

Birêz Hicrî, her wiha rolê keç û jinên di kêleka birayên xwe yê Pêşmerge de bilind nixand û got: "Îro keç û jinên Pêşmerge dan xuyakirinê ku xebat di pêxema gihîştin bi armancên 25'ê Gelawêjê de, bêt beşdariya wan serkakeve".

Hêjayî gotinê ye ku di wî meşqî de ji aliyê Sekreterê Giştî yê PDK Îranê ve, rêz ji mam Welî, Pêşmergeyê dêrîn yê PDK Îranê ku di temenê 75 saliyê de mil bi milê Pêşmergeyên din beşdarî meşqê bibû, hate girtin. Meşq seet 18'ê piştî nivro dawî pê hat.

Malpera Sekreterê Giştî Yê PDK Îranê Vebû



Daxuyaniya Çapemeniyê

Malpera Sekreterê Giştî yê PDK Îranê bi sê zimanên Kurdî, Farsî û Îngilîzî weşana xwe dest pê kir.

Bi armanca gehandina nûçe û çalakiyên Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, birêz Mistefa Hicrî, malpera **Sekreterê Giştî yê PDK Îranê** vebû.

Armanca malpera Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, ji bilî belavkirina nûçeyên çalakiyê, hevdiya û nivîsarên Sekreterê Giştî, çêkirina rê û îmkana pêwendîya rasterast a xelkê û rêberiya Partiya Demokrat ya Kurdistanê Îranê ye.

Malpera Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, ji bo bersivdan bi pêwîstiyên agadarbûna rasterast a xelkê ji bîr û ramanên rêberiya partiyê û her wiha bi armanca wergirtina bîr û hizra welatîyan hatiye avakirin. Ev malpera ji aliyê Sekreterê Giştî yê PDK Îranê ve û bi alîkariya desteya rêveber ya malpera "Sikirter"ê birêve diçe.

Mêvanên malperê dikarin ji rêya wê malperê ve rasterast pirs, pêşniyar û dîtin û nêrînên xwe ji bo Sekreterê Giştî yê PDK Îranê bişînin.

Malpera "Sikirter" yekemîn malpera rêberiya partiyên Kurdistanî ye.

Navnîşanê malpera Sekreterê Giştî yê Partiyê:

www.sikirter.org

**Beşa Ragihandina Komîteya Kar û Barên PDK Îranê li
Derveyî Welat
Parîs - 16.08.2007
25'ê Gelawêha 2707'an a Kurdî**

Gerrek Kurt Di Dîrokê De ...

Amadekar: Nûredîn Sofizade

01.08: Roja Cîhanî ya Şîrê Dayikê.

01.08.1986: Di demekê de ku komek ji Pêşmergeyên PDK Îranê li gundê **Masîrşêx** li devera Seqizê di halê veheviyanê da bûn, ketin ber êrîşê. Mixabin 5 Pêşmerge bi navên: **Mihemed Mistefayî, Ebdula Husênî, Ebdula Ebdî, Ebas Biheştî, Husên Îbrahîmî** şehîd bûn.

01.08.1986: Bengîn Zebîhî Fermanderê Pel ji Hêza Efqîn li devera Mehabadê de şehîd bû.

02.08.1922: Çap û belavbûna yekemîn hejmara rojnama **Banga Kurdistan** ku rojnameyeke çandî, edebî û hunerî bû û gellek xizmeta rewşenbîriya neteweyî kir.

02.08.1990: Artêşa Îraqê êrîş kire ser welatê Kuweytê û piştî çend rojan karîna parekî zaf axa wî welatî dagir û talan bikin.

03.08.1979: Hilbijartina Endamên Meclîsa Xobreganê li Îranê de. Di wê hilbijartinê de ku **Dr. Qasimlo** xwe berbijêr kiribû, bi anîna 113773 dangan li parêzgeha Urmiyê de serkevt bo nûneriya wê meclîsê, lê Dr. Qasimlo naçe, ji ber ku li Tehranê ji bo girtina Dr. Qasimlo pîlan darêtibûn.

04.08.1960: Siyasetvanê navdar ê Kurd **Refîq Hêlmî** koça dawiyê kir.

04.08.1994: Xefûr Hemzeyî endamê Komîteya Navendî ya PDK Îranê û nûnerê partiyê li Bexdayê ji aliyê terorîstên rejîma Komara Îslamî ya Îranê ve hat terorkirin û şehîd bû.

05.08.1906: Destpêkirina şorişa **Meşrûtiyetê** li Îranê.

06.08.1945: Lêdana bombeya Etomî li bajarê Hîroşîmaya Japonê ji aliyê Amrîka ve ku pitir ji 100 hezar kes bûne qurbanî, bandora wê niha jî her ser jiyana xelkê wir maye.

06.08.1988: Li Çemê Kelvê li devera Pîranşarê 5 Pêşmergeyên Hêza Qendîl xendiqîn. Navên wan ev bûn: **Tahir Tase, Yûsif Ehmedî, Bayezîd Xizrî, Husên Mamendî û Elî Vsowesîl.**

06.08.1990: Silêman Resûlzade Endamê Komîte Şaristana Pîranşarê tevî Pêşmergeyêkî din bi navê **Rehîm Perşan** li devera Lacan ya Pîranşarê şehîd bûn.

06.08.1991: Şapûr Bextiyar Serok Wezîrê pêşîn yê Îranê tevî hevalê xwe **Sîrûs Ketîbe** li Parîsê ji aliyê terorîstên Komara Îslamî ya Îranê ve hate terorkirin.

07.08.1992: Freydûn Ferozad, siyasetvan, sînemakar û helbestvanê Îranî di mala xwe de li welatê Almaniyayê ji aliyê terorîstên Komara Îslamî a Îranê ve hate kuştin.

07.08.2005: Di dirêjîya serhildana xelkê Kurdistanê ji bo piştevanî ji xelkê bajarê Mehabadê, xelkê bajarê Seqizê serhildan kirin, ew meşa gel li Seqizê kete ber êrîşa hêzên tepeserkar ên rejîmê ku 13 kes ji xelkê sivil şehîd bûn û bi dehan kes birîndar bûn û bi sedan kes jî hatin binçavkirin.

08.08.1984: Li girtîxaneyê bajarê Tekabê de, 9 Pêşmergeyên PDK Îranê bi navên: **Kerîm Hacî, Ebdulrehman Yûsifî, Hadî Pîşkarî, Mihemed Salih Êyvezî, Tofîq Feramerzî, Yeqûb Burnayî, Umer Qehremanî û Eta Yezdanpenah.**

08.08.1990: Girtina Kuweytê ji aliyê Artêşa Îraqê ve.

10.08.1920: Îmzakirina peymanê **Sêvîr**ê û bi fermînasîna mafê xwedî welatbûna Kurdan. Nûnerê Kurdan **Şerîfpaşa** bû ku ew peymanê îmze kir.

11.08.1988: Feqê Îbrahîm Çavşînî, Endamê Komîte Şaristana Şinoyê li girtîgeha rejîmê de hat îdamkirin.

12.08.1990: Elî Xizirniya Fermanderê Pel ji hêza Giyareng naskirî bi **Elî basavekî** li devera Bolfeta Serdeştê şehîd bû.

14.08.1990: Bayiz Mihemedî Fermanderê Pel ji Hêza Pêşewa li devera Mangoran a Mehabadê şehîd bû.

15.08.1979: Şehîdbûna 21 kes ji xelkê bajarê Seqizê ji aliyê cinayetkarên rejîma Komara Îslamî ve.

15.08.1982: Destpêbûna şerê çekdarî yê **PKK**ê tevî dewleta Tirkîyê.

15.08.1985: Sale Husênî berpîrsê Komîte Mangoran li Hemzeavayê şehîd bû.

Dara Natiq, Sekreterê YCDK Îranê:

Armanç ji girtina kongireya çaremîn, pêkanîna guhartineki bingehîn di vê rêxistinê û vekirina rûpelekî nû ji kar û xebata ciwanan bo bidevaneîna civakekî demokratîk û federal e.

Xwendewanên hêja!

Çend rojan berî niha wate seet 9:30 sibêdeya roja şemî, 4'ê Tebaxa 2007'an, Kongireya Çaremîn ya YCDK Îranê bi navê Pêşveçûn û li bin dirûşma ber bi pêşerojek rontir dest bi karên xwe kir û piştî 3 rojan karê berdewam, seet 12:30'ê şeva duşem(7.8.2007) serkevtiyane dawî bi karên xwe anî.

Her di vê derheqê de me hevpeyvînek kurt bi birêz Dara Natiq, Sekreterê Giştî yê vê rêxistinê re pêk anî ku em bala we bo xwendina wê dikîşînin:

Hevpeyvîn/ Selîm Zencîrî

Birêz Dara Natiq, berî her tiştî ez bi navê rojnameya Agirî ve serkevtina Kongireya we ya çaremîn ji te û tev xebatkarên Yekîtiya Ciwanan pîroz dikim.

Ez jî li ser navê tev Komîteya birêveberiya Giştî ya YCDK Îranê, serkevtina çaremîn Kongireya xwe ji we û tev xelkê Kurdistanê û hemû xortên şoreşvan û azadîxwaz yê Kurdistanê pîroz dikim û hêvîdar im ku em jî bi harkarî û piştgirîya tev aliyekê li kar û xebatên xwe di pêxema pêşvebirina armançên vê rêxistinê de serkevtî bin.

Armanç ji girtina Kongireya we ya çaremîn çi bû?

YCDK Îranê, herwek di bernamê û pirograma xwe de aniye, her du salan carekê kongireya xwe li dar dixe. Bêguman Kongire jî weke organekî herî xwedî kêrhatîbûn û xwedî biryar a YCDK Îranê, bo nixandîna û şirovekirina kar û xebatên vê rêxistinê di navbera du Kongiran de tê lidarxistin. Di heman demê de Kongire navenda darêtiya siyasî û şirovekirina pirsên pêwendîdar bi vê rêxistinê û pîrsa ciwanên Kurd di Kurdistanê Îranê de ye û bi giştî em dikarin bibêjin ku diyarîkirina armanç û sitratêjiyên vê rêxistinê ye. Bi giştî armanç ji girtina kongireya çaremîn pêkanîna guhartineki bingehîn di vê rêxistinê û vekirina rûpelekî nû ji kar û xebata ciwanan bo bidevaneîna civakekî demokratîk û federal e.

Kongireya vê carê çi cudahiyeke tevî Kongireyên berê de hebû?

Bê şik Kongireya vê carê serbarê wê rewş û zirûfa taybetî û nexwaz ku bi ser me de hat, çûneder hin hevalên me ên berê di 8 heyvên derbasbûyî ji refên YCDK Îranê li bin bandora taqîma Mela Hesên Restigâr de, lê bi awayekî pir berçav û berfireh nûnerên lawan bo Kongirê li Kurdistanê û bi taybet derveyî welat zêdetir ji 40 kesî di piraniya welatên Ewropayê de beşdarî kongirê bûn. Herwiha zêdebûna rêjeya keçan û

beşdariya ektîv ya wan li ser pirsên çarenûsaz di nava kongirê de û hebûna fezayekî demokratîk û bashilgir û herwiha hebûna hêzekî guhartinxwaz û çeleng di kongirê de, ji taybetmendiyên herî berçav yê Kongirê bi nîsbet Kongireyên berê bû.

Kongire heya çihas demokratîk bû?

Pêkanîna fezayekî demokratîk li ser bingeha bihevî jiyan û ji hev fêmkirinê yek ji eslên herî bingehîn yê her sistemeke demokratîk bo cihgîrkirina civakeke sîvil û demokratîk e. Lewma hebûna rewş û fezayekî demokratîk dikare baştirîn mîkanîzm be bo çareserkirina arîşe û pîrsgirêkên her civakê û vê civakê ber bi pêşve bibe. Lewma YCDK Îranê û ciwanên pişkdar di kongirê de bi heştîkirin bi vê eslê, karin fezayekî salim û demokratîk bi ser Kongirê de cihgir bikin û afirandîna fezayekî wiha ji destkevtên herî girîng yê Kongirê bûn.

Gelo hûn dikarin îşare bi reform û guhartinên ku di Kongireya we ya çaremîn de çê bûn, bikin?

Bêşik her Kongireyekî komek guhartin û reformên bingehîn li gorî berhevdan û guhartinên herêmî û cîhanî bi xwe re tine. Guhartin û reformên ku di vê Kongirê de hatin pêş, ez dikarin îşare bi guhartina sistema birêveberiyê bi awayekî îroyî û herwiha hewildan bo pêkanîna sistemeke sosyalîstî di civakê de û xebat bo cudahiya ol ji dewletê û pesendkirina komek alternatîv û pirojeyên evroyî bo bihêztirîkirina rêxistinê Yekîtiya ciwanan li Kurdistanê û derveyî welat û herwiha cîhanîtkirina wê rêxistinê bikim.

Astê beşdarî û têgihîştina nûnerên Kongirê li bas û nîqaşên nava Kongirê de çawa bû?

Bi rastî ewa ku di vê Kongirê de cihê heyrîmanê bû, beşdariya çeleng û ektîv a beşdarên Kongirê weke hêzekî guhartinxwaz, xwedî bandor li ser pirsên çarenivîsaz û girêdayî

bi pîrsa Kurd, ciwanên Kurd bi giştî û bi taybetî ciwanên Kurd di Kurdistanê Îranê de û herwiha pîrsên pêwendîdar bi qeder û pêşeroja vê rêxistinê bû. Nûnerên Kongirê karin bi bîr û hizrên îroyî, zanistî û bi dîr ji her hizreke berteng û îdeolojîkî û weke nîfşek evroyî, guhartinxwaz û rewşenbîr, roleke ektîv û bibandor li ser pêvajoya pêşvebirina karê kongirê û zindîkirina Kongirê bilfîzin.

Armançên stratejîk yê Kongira çaremîn çi bûn?

Armanç û stratejiyên bingehîn yê Kongirê pêkhatîbûn ji: xebat bo pêkanîna civakeke demokratîk û sosyalîst, tekezîkirina zêdetir derheq xwestên xwe yê neteweyî û sîvil, handana Ciwanan di nava bizava rizgarîxwaz a gelê Kurd û perwerdekirin û jêhelbirina astê hişyariya neteweyî ya nava civaka Kurdistanê, xebat û têkoşîn di pêxema pêkanîna civakekî azad û demokratîk di Îran û Kurdistanê de, xebat bo misogerkirina mafên tev tex û qatên civakê ji rêya rêxistinê taybet bi xwe û piştgirî û beşdarî li bizava rizgarîxwaz a gelê Kurd bi rêberiya PDK Îranê, girîngîdan û piştewani ji xebata berheq a jinan, xwendekaran û Ciwanan di navxwe û derveyî welat û berhevdan û şirovekirina siyasîyên şaş û çewt yê Komara Îslamî a Îranê derheq xelkê Kurdistanê û bi taybetî ciwanên Kurd...

Asta beşdariya keçan di vê Kongirê de û rola wan di rêberiya nû de?

Beşdariya pir a keçan di vê Kongirê de û bas û gengeşeyên wan derheq pîrsên çarenûsaz û girêdayî bi pêşeroja vê rêxistinê ve cihê baldan û heyrîmana nûnerên Kongirê bû. Herwiha asta hişyarî û têgihîştina wan li ser pîrsên cur bi cur û xwe berbijarkirin û hilbijartina rêjeya zafa wan bo asta birêveberiya kar û xebatên vê rêxistinê ji destkevtên herî girîng yê Kongirê bûn.

Gelo we ji bo sistema birêveberiya rêxistinî ya lawan li derveyî welat ku berê nîqaş û gengeşeyên cur bi cur li ser de hebûn, çi mekanîzmekî wekî pîrensîp bi biryar girt?

Bi salan bû ku bi sedema hebûna alozî di sistema birêveberiya Yekîtiya Ciwanan li derveyî welat, teşkîlata me li derveyî welat tûşî bê ser u beriyê hatibû. Lewma Kongirê bo jinavbirin û çareserkirina wê pîrsê, 5 kes weke endamê rêberî li derveyî welat, ku 3 kes ji wan endamên eslî û 2 kes jî weke cigir bo pêkanîna komîteyekê, bi merema rêvebirina kar û barên YCDK Îranê li derveyî welat hilbijart. Ew komîteye nûneratiya kar û barê lawan li derveyî welat dike.

Hate ragehandin ku şandek ji rêveberiya PDK Îranê berdewam di civînên Kongirê de beşdar bûye, ev beşdariya li ser çi esas û bingehêkê bû?

YCDK Îranê hertim di bernamê û pirograma xwe de ragehandiyê ku PDK Îranê bi rêberê bizava rizgarîxwaz a gelê Kurd li Rohhilata Kurdistanê dizane û vê partiyê bi piştevan û rênîşanderê xwe dihesibîne. Lê şanda navbirî tenê weke mêvan beşdarî Kongirê bû û Kongirê jî gellek bi şanazî ve pêşwazî û mêvandariya şanda PDK Îranê kir.

Pîlan û pirojeyên we bo pêşvebirina armançên vê rêxistinê û herwiha mekanîzma nû ya we bo pêwendî tevî rêxistinê sîvil bi çi awayekê ye?

Di vê Kongirê de komek bernamê û pirojeyên nû ji bo çawaniya pêşvebirina armanç û stratejiyên vê rêxistinê û herwiha bihêztirîkirina refên teşkîlatiyên vê rêxistinê li hundir û derveyî welat hatin pesend kirin, ku di pêşerojêkê nêzik de bi piraktîzîkirina pêwendiyên tevî rêxistinê demokratîk yê cîhanî û Kurdistanî kir û biryar hate dayîn ku bo bihêztirîkirina wan pêwendiyên dibe gavên îroyî û bibandor bihên avêtin **Spas bo beşdariya we li vê hevpeyvîne de**

Xatirxwestina Zarokekî

Ahmet Kaya / Erxenî

Nameya kurikekî bê dev, bê çav, bê guh, bê dest û ling. Nameya zarokekî bê netewe, bê xwedî û kes. Nameya zarokekî ku bêje 1000 dolar pere dikare şûna we hemûyan dagire. An jî jiyane tiştêkî wisa pê dabe famkirin. Bêxwedîtî tiştêkî wisa ye.

Ku 20 milyon kurd xwediyê mirov be û kesekî mirov tune be. Ku dewlet 85 milyon nifûs be û mirov bêxwedî be. Ku bi dehan partî hebin, ku hinek ji wan dengê bav û dayika mirov jî bistînin û mirov bêxwedî be. Ku mirov nexweş ket, ji dest û ling ket, ji çav û guhan bû û hat ber mirinê. Ku mirov hêj temenê xwe yê 3 salî tijî nekiribe û navê mirov Ahmet Kaya be, yanî mirineke li dervê welat bîne biro mirovan?

Ez Ahmet Kaya. Lawikekî 3 salî, li navçeya Erxenî. Hûn Erxeniyê dizanin? Waye girêdayî bajarê Amedê ye. Dibêjin 2 milyon nifûsa Amedê heye, bajarekî mezin e û hemû kurd in. Dibêjin li wir 5 şaredarî hene di destê kurdan de. Nizanim, min nedîtiye. Û ji niha û pê ve jî ezê nebînim. Ji ber ku min çavên xwe winda kir.

Çiroka çavên min ne dirêj e. Jixwe temenê min hemû 3 sal in. Nizanim ji çi bû, lê nikaribûm xweşik bimeşiyama. Dibe ku ji feqîrî be û diya min



xweşik xwarinek nexwaribe ku ez di zikê wê de baş pêşketima. Lê qeder ev bû. Haya min ji tiştêkî tune. Ez ne bi biryara xwe hatim vê cihanê jixwe. Min bizaniya ku neteweke min a wisa dê hebe, ku di destê min de bûya, belkî ez nehatima. Belkî min ji xwe re neteweke din hilbijarta. Welhasil ez nikaribûm bimeşiyama û dayik û bav xizan bûn.

Bi alîkariya çend mirovên baş 500 YTL pere ket destê wan. Hema bêjin 250 Euro an jî hindêkî bêhtir. Belkî gelek kes nizanin YTL tê çi wateyê. Ez bêjim li dora 400 dolaran dike. Bi vî pereyî ez birim Amedê, cem doktorekî taybet. Heta wê demê jî ez hinekî dimeşiyam. Tew tune be çavên min hebûn, ez dixavim û min dibihîst. Lê doktor 500 YTL hindik hesaband. Li cem xwe ameliyateke wisa kir ku niha min çav jî winda kirin. Ez nema dikarim bi xavim jî. Doktor gotibû hêta wî jî cih derketiye û

gotibû ezê platin têxim hêta wî. Lê piştî ameliyatê birin li ser laşê min peyda bûn. Ji ber ku doktor platin nexistibû laşê min, maddeyêke erzanîr xistibûyê.

Heke hêviyek min ji we hebe, ez xêrê ji xwe nebînim. Jixwe haya min ji we tune. Min xêrek ji dê û bav nediye, ezê ji we bibînim? Bavê min dibêje heke kurê min bimire ezê dozê li doktor vekim. Belkî wî jî wekî doktor çav berdabe çend qurîş perê dadgehê û doza ku dê qezenc bike. Ezê ji belqîtî bibim û biçim.

Min hûn nedîtin û ezê biçim. Lê dîsa jî ezê çend gotinan bêjim. Baş e ku min derdê we bêhtir nekişand. Mirov çawa 20 milyon nifûs be, çawa partiyên mirov, saziyên mirov hebin û li ser koltixan behsa netewe û zimanan bikin û çawa halê gelê mirov ev be. Çawa saziyek mirov tune be ji bo alîkariya rewşên wiha.

Ma nizanim dê çi xêr ji we were. Bi hezaran zarokên şehîdan jî di rewşa min de ne. Hûn bikêr wan bihatina, belkî dê bikêr min jî bihatina. Yê ku canê xwe di ber we de dan ketibin wî halî, halê min ne cihê gazinan e.

Berî mirina xwe gotineke min heye kin û kurt. Xwe bikin însan û saziyekê ava bikin. Kampanyayekê çêkin û ji bo zarokên wekî min alîkariyê bikin. Belkî wê demê nifşekî ji we çêtir derkeve holê. Heke wisa nebe, heke hûn nikaribin hereketêke sivil bidin destpêkirin û çend birînan derman bikin, tu hêvî di pêşeroja we de tune.

kasibkar bi navên **Şoreş Teblîxî** û **Reşo Şexani**, piştî derbazbûn li boseyê hêzên ewlehekarî yê rejîmê, dikevina nava meydana mayînan û seba teqîna mayîne bi xurtî birîndar dibin.

Şeva 27.07.2007'an, birîndarbûna du kasibkarên akinciyê gundê Pesvê a ser bi bajarê Pîranşarê ku bû sebebê pevçûna xelkê tevî hêzên rejîmê.

Êvarîya roja 30.07.2007'an, kuştina keskê bi navê **Abdulrehman**, xelkê gundê Qulquleya bajarê Merîwanê, ji aliyê hêzên rejîmê ve.

Roja 02.08.2007'an kesek bi navê Resûl, kurê Letîf, xelkê gundê Kêmneya Hewramanê, seba teqîna mayîne lingek xwe ji dest dide.

Şeva 04 li ser 05.08.2007'an, kuştina kasibkarekê bi navê **Ferhad**, kurê Adil Apoçî, akinciyê gundê Enbê, ser bi devera Tîrgewer a bajarê Urmîyê. Her wiha kesekî din bi navê **Sefiyedîn Piyade** bi xurtî birîndar bû.

Derkirina biryara zîndanê bo sê kesên bajarê Merîwanê bi navên **Azer Qesimî**, **Ferhad Mehmûdiyan** û **Îrec Kûşîşî**, bi buxtana hebûna pêwendiyên tevî partiyên siyasî yê Kurdistanê ku her yek ji wan bi rêz 5 sal, 3 sal û 2 sal cezayê zîndanê hatine mehkûmkirin.

Kuştin, Birîndarkirin û Girtina Xelkê Sivîl Yê Kurdistanê, Di Heyamê Çend Hefteyên Borî De

Kuştin, birîndarkirin, girtin û binçavkirina çîn û qatên cur bi cur ên xelkê Kurdistanê ji aliyê hêzên dijî gelî ên rejîmê ve her dom dike

û li gor ew nûçeyên ku ji aliyê Navenda Nûçeyan a PDK Îranê gihîştine destê me, di heyamê çend hefteyên borî de çendin kes ji xelkê sivîl ên Kurdistanê li encama êrîşa hêzên tepeserker ên rejîmê ve hatine kuştin û birîndar kirine. Herwiha çendin kes jî hatine girtin yan cezaya girtixaneyê li ser wan hatiye sepandin, ku emê li jêr de îşareyekî bi çend mînakên ji van kiryarên rejîmê bikin:

Derkirina biryara 2 mehan zîndanê bo çalakekê xwendekarî, bi navê **Ares Xandil**, Endamê Deftera "Tehkîm Wehdet" a Îlamê. Navhatî di civîna roja 10.07.2007'an de, tevî 12 kesên din ji aliyê hêzên rejîmê ve hatne girtin.

Şeva 12.07.2007'an, girtina du kesan bi navên **Kerîm Kanî Sanî** û **Bextiyar Rehîmî**, li bajarê Merîwanê û dest bi ser de girtina hindêk belge û alavên taybetî ên girtiyar ji aliyê hêzên rejîmê ve.

18.07.2007'an, girtina çend kesan ji endamên tîpa govenda Dîlanê, li bajarê Bokanê ku navhatî ne ji: **Rehman**



Ibrahimiyan, Xalid Hesenzade, Omîd Kurde, Bextiyar û Diyako.

Roja 22.07.2007'an, girtina Ako Kurdneseb, Endamê Desteya Nivîskar ya Heftînameya "Kereftû" ji aliyê hêzên rejîmê ve. Navhatî heya niha çend caran ji aliyê bédadgehên rejîmê ve hatiye bangkirin û herwiha ji aliyê hêzên rejîmê ve gef lê hatiye xwarin. Navhatî ber bi cîyê nediyaar hatiye şandin û seba girtina wî jî hêj ne rohn e.

Roja 22.07.2007'an, kuştina kasibkarekê bi navê **Riza Yûsifî**, xelkê gundê Banî ser bi bajarê Urmîyê û birîndarbûna kesekî din bi navê Hekîm Şaî, xelkê Bêsitkê.

Şeva 25 li ser 26.07.2007'an, du

MAFÊ ZAROKAN

ADAR JIYAN

adarjiyan@mynet.com



Danezana Mafê Mirovan A Gerdûnê ji aliye NY (Neteweyên Yekbûyî) ve di mêtûya 1948'an de hatiye pejiandin. Piştî vê biryarê, bi yazdeh salan anga di sala 1959'an de bi mebesta perwerdekirin û hîndekariya zarokan 'Danezana Mafê Zarokan' di rojnameya fermî de hatiye weşandin. (Hejmara biryarê:1386)

"Xala 7'an: Mafê zarokan ê perwerdehî û hîndekariyê bi zimanê zikmakî ye û bê dirav e. Ji bo ku zarok çanda xwe ya giştî hîn bibin divê wekî hemû zarokan ku bi yeksanî û bi zimanê xwe yê zikmakî werin perwerde kirin..."

Ji bo ku civak an jî neteweyek hebûna xwe bidomîne, divê pêşî bi zimanê xwe yê zikmakî perwerde bibe. Perwerdehî, bi awayekî giştî, wekî dem û domana hemû guhertin û sazandina reftar û tevgerên mirov ên civakî tê zanîn.. Bi rastî, li ser rûyê dinê, tu mirovên ku nehatibin/neyên perwerdekirin nîn in.. Çimkî pêvajoya hêvojkariya mirov hê ji ducaniya dayika mirov dest pê dike û heta dawiya temenê wî/wê didome. Heta hin perwerdekarên pispor hene ku destpêka perwerdehiya mirov şûndetir dibînin û perwerdehiyê rasterê bi rewşa perwerdehiya dê û dapîr û bav û bapîrên mirov ve girê didin. Wekî ku hin pispor û zanyarên perwerdehiyê jî dibêjin: "Heke hûn dixwazin zarokê/î baş perwerde bikin, ji dapîra wî/wê dest pê bikin." Ji ber wê, çî mirovên (heta lewir jî) ku hene bi awayekî bi perwerdehiyê nasdar dibin. Lê belê bi çî awayî an bi çî şêwazê, ji bo çî, çawa û di kîjan mercan de perwerde dibin, ew tişteki din e. Pêwist e ku mirov li ser van pirsan baş bikire.

Berî her tiştî divê mirov rêmên û têtgehên zaneyane bizanibe û wan baş rave bike. Carekê çî tiştên ku hene, tenê ne reş û spî pêk hatine. Ev nêrîn û nêzikayîtdanên rûxarkî û serkî, dûrî azîneyên zanistê ne. Raman û helwestên bi vî awayî mirov arasteyî pêşdarazî, çewtî û xeletiyên dike. Wekî mînak: Gava ku mirov bibêje: "Ev zarok bê perwerde maye." Bê awarte dê herkes vê yekê bi vî awayî şîrove bike û bibêje qey ev zarok neçûye dibistanê anga xwendin û nivîsandina wî/wê nîn e û ji perwerdehiyê bêpar maye. Belê ya rast ne ev e. Lewre dem û domanên perwerdehiyê tenê bi sazî û dezgehên fermî yê mîna dibistan û zanîngehan nayên sînardarkirin. Rabûn, rûniştin, xwarin, vexwarin û hemû livbaziyan mirov bi saya perwerdehiyê pêk tên û her yek ji van bi serê xwe rê û rêbazên perwerdehiyê ne

Zarokeke ku nû ji dayik dibe, ji bilî cest û giyana xwe tişteki bi xwe re nayne dinê. Hemû liv, bizav û tevgerên xwe, hin bi hin ji kesên der û dora xwe (malbat, xwişk û bira û heval) fêr dibe. Carekê, sê hêmayên bingehîn ên ku bandorê li ser perwerdehiya mirov dike, hene. Yek; malbat, du; dibistan sê; civak û derdor (televîzyon, radyo, sînema û hwd.) Îro ro perwerdehiya her mirovî/ê di nava vê sêgoşeyê de dirb û dirûv digire. Bi kinayî jiyana mirov bi perwerdehiyê dest pê dike, bi perwerdehiyê didome û bi perwerdehiyê bi dawî dibe. Ango tu kes ji perwerdehiyê ne bêpar e. Cihêwazî, xwe di şêwaza perwerdehiyê de dide der. . Cureyên perwerdehiyê bi xislet û çawaniyên xwe, bi şêwe û şêwazên xwe, bi merc û derfetên xwe ji hev û din vediqetin. Belê divê vê ji bo her mirovî/ê hewceyê bi perwerdehiyêke bi rêk û pêk heye.

Ligel ku gelek hêmanên perwerdehiyê hebin jî dîsa ya herî girîng mebest û ramana perwerdehiyê û felsefeya wê ye. Gelo îro pergala û şêwazên perwerdehiyê bi çî mebestê pêk tên û bi çî awayî didomin? Carekê mebest û armanca dûgelên mêtînger û hêzên desthilatdar ne perwerdekirina mirov û mirovahiyê ye. Wekî hemû dezgeh û sazûmanên wan, dibistan, zanîngeh, zanko û saziyên perwerdehiyê bi mebesta berjewendiyên aborî, bi egera parastin û misogerkirina desthilatdariyê ava bûne. Her dûgel, zarokên gelan ji bo ku di di suxreya pergala sazûmanî de bixebitînin perwerde dikin. Perwerdekirina mirovan her car li gorî bîrdoza fermî û ferasetêke statukoparêz didome.

Hêzên zoran û mêtînger bi hemû alav û amrazên perwerdehiyê û berên teknolojîyê raselîtîni ser serê zarokên gelan dibin. Zêç û zarokên wan di pêçekê de ji ber wan digirin û li gorî dilê xwe perwerde dikin. Ji pêçekên şîrmij bigirin heta ciwanên bîst salî, mêtîyê wan bi hizrên serdest û desthilatdar tene şehrandin û lewitandin.. Çî zarokên ku bi xwe hay dibin, xwe di nav vê perwerdehiya têtçûyî û genî de dibînin. Ji televîzyonan bigirin heta dibistan û zanîngehan, ji sînema û şanoyan bigirin heta werzîş û hengemeyan hemû bi qesta suxreya bişavkariyê û windakirina zarokên gelan dixebitîn..

Îro, sazî û dezgeh, televîzyon û çapemenî, weşan û pirtûkxane...hemû bi hestên şoven û nijadperest tene xebitandin. Hemû sazî û dezgehên desthilatdar ji bo vê yekê, pevra dikevin rikberî û pêşbaziye. Li hemberî vê yekê, Hewceye ku her zarok pêşî di malbatê de û peyre li dibistan û zanîngehên zanistî, bi awayekî yeksan werin perwerdekirin.

Helbest Ji Kur Maye?

Serbest Urmiye



Di hesreta dîtina rûmet
Şopa bajar, deşt û zinar
Bi pirs û bê bersiv derketim
Lê
Ne xuya û li kur maye
Nizanim
Ta ku duh
Êvarî dema şevê
Hate bersiv
Pîrê hekîm, zanayê rê:
Ji şerma rûmetê diya niştîman
Û
Termê Şehîd
Bêhna xwînê û zamên birînê
Ji keserên ser bixêliya nû bûka Zîlanê
Bigire heta
Hesreta, evîna di dil de mayî ya
Taze zavayê Agirî
Xwîna bikîna a
Dim Dim a berxwedanê
Heyfa
Kolanên bixwîn
Ên Helebçeya Şehîd
Laye laye ya
Landika bê lorî a Terexe
Û
Lorî, lorî ya
Diya sêviyên Çarçira
Ji dîtina
Xwîna Ferhad,
Şerma evîna Şirîna çav li rê
Di
Nasnameyên wendakirî yên
Qamişlo û Efrînê de
Veşartiye xwe
Va hatim,
Lê bibore ji min
Rû reş û şermezar
Diya niştîman
Bi destên vala
Li hember te ez
Bi sed pirsyarên bê bersiv
Êdî nepirse ji min
Ku
Ta bi key
Dê Şehîd av û têhnî
Dilê erdê be, dar û zevî
Di behya vendabûyên tîrêjên rojê de
Dê şîr bigêre diya niştîman Û
Reş girêde tariye şevan
Asîman
Wêl û heyran
Di reşembêza asîmanên şevgirtî de
Dilşiketiyan kevokên aştîyê
Li ser sînga diya bîniştîman bifirin
Di mizgîna vendabûna
Tîrêjên rojê de
Dê biger û govend bin
Bi defa mitrib û cama saqî
Kore kundên şevperest
De nebêjê, bes êdî
Ku kevneşop e û xwîn, buha
Ma binirx çend e
Azadî?

Hunermend Tîrêj Urmiye:

“HER HUNERMEND PIŞTA XWE NEDE HÊZA XWE, BÎ TEQLÎD Û ZARVEKIRINÊ NIKARE ÇI BIKE”

Li çend rojên borî de min mêvândariya helbestvan û hunermendê ciwan, hêja û dengxweş yê gelê me li Kurdistana Îranê, hunermend Tîrêj Urmiye kir. Min çend pirsiyarek derheq jiyan, kar û xebatên hunerî û...raberî wî kirin. Wî jî bi dilek vekirî, bi hestek hunerî û welatparêzî pirsiyarên min bersivandin ku li jêr de bala we bo xwendina vê guftûgoyê dikişînim.

Hevpeyvîn: Selîm Zencîrî

Kekê Tîrêj, berî her tiştî ez bixêrhatina te dikim. Spasiya te jî dikim bona wê ku te mêvândariya me

qebûl kir û beşdarî wê hevpeyvînê bûy.

Ez jî li cihê xwe de sipasiya we dikim. Serkevîtin û serbilindiyê ji we re hêvî dikim. Hêvîxwaz im mînakên karê we û xebatkarên wekî we hîna zêdetir bin.

Tîrêj can ez dixwazim ji zimanê te bixwe ve hîna baştir te bi xwendevanan bidim nasandin, kerem bike?

Ez Tîrêj Urmiye xelkê bajarê Urmiyê ji Rojhilatê Kurdistanê me. Sala 1983'an her li wî bajarî hatime dinyayê. Min xwendina xwe ya dibistan, navendî û paşnavendî jî her li wî bajarî de bi dawî aniye. Jiyan min bi giştî li Rojhilatê Kurdistanê de derbas bûye. Lê eva 3 – 4 sal in ku ez li Başûr dijîm.

Sedemên derketina te ji Rojhilatê Kurdistanê çi bûn?

Sedema herî bingeşîn fikr û xeyalên min yê hunerî û welatparêziyê bûn. Eşqa min ya strangotînê bû ku tevî min jiyan dikir. Lê li Rojhilatê Kurdistanê ne ew derfet hebû, ne jî ew serbestî hebû ku min karîba bi azadî ew tiştên ku li dilê min de hene, bînme ziman. Lewra nebûna wan derfetan bera min da Başûrê Kurdistanê.

kek Tîrêj, kengê bû te hest bi vê çendê kir ku dengê te xweş e û tu dikarî bibî bi hunermend?

Li rastî de niha jî ez hest bi xweşiya dengê xwe nakim. Ez li temenek gellek biçûk de bûm ku meraq, hezkirin û eşqek di cewherê min de beranberî karê hunerî, xebatên hunerî û bi taybet strangotînê de çê bû ku ew jî çavkaniya xwe ji hestê welatparêzî, ji hestê dayîk, ji hestê axê, ji lêgerîna azadî û serbestî û wekhevîyê digire.

Destpêka karê min li sala 4'ê seretayî (dibistanê)de bû ku wê demê ez li nava hevalên xwe yê dibistanê de bûm yekem. Paşan xebatên min berdewam kirin, xeyalên min bûn bi sîstem û armanc çê kirin. Heyanî ez derbasî sala dawîn ya Paşnavendî(Dibîristanê)ê bûm. Her wê salê de min sê stran bi navên **Welatê min, Gula hemû dila û Bilbila bêgefes** çê kirin ku her sê jî li ser rewşa siyasî ya Kurdistanê di wê demê de bûn. Ji ber wan stranên ez jî



xwendinê û karê hunerî hatim bêparkirin. Malbata min zanîn ku karê min yê hunerî bûye sebebê derxistina min, lewra dijberiyek malbatî jî li beranber karê min yê hunerî çê bû û min nekarî heta ligel endamên malbata xwe jî bi karê xwe yê hunerî bijîm.

Ji aliyê din jî, Kurdên me yê Rojhilatê tu derfet bo karên hunerî, raqihandin û rewşenbîriyê ninin. Yan divêt mirov bi zimanê sîstemê, li gorî sîstemê, bi fikr û armancên sîstemê û ji bo sîstemê be, yan jî tu cihê ji bo me nine. Bi giştî tu cih û mafên me yê hunerî, çandî, siyasî û neteweyî li sîstem û yasaya sîstemê de ninin û nebûna wan derfetan gellek ez tenga kirim. Lewra ji sala 2004'an vir de ez derbasî qonaxekî din li jiyana bûm û derketime başûr. Bi vî awayî min dest bi xebata hunerî kir û ligel komên muzîkê, rêxistin û kesayetiyên hunerî me karî destpêkekê ava bikin û encam jî albûma **Ez kî me** jê çê bû ku ji 12 stranên pêk hatibû û heya niha 4 stran, min kilîf kirine.

Wê demê yanî li Rojhilatê de kesek hebû ku te zêde hay bide û ji boy te bibe destek û alîkar di karê hunerî de?

Na, ger kesekî li wir destek û alîkarî bidaba min, renga min karîba zûtir, hîna baştir, destpêkek birêk û pêktir û serkevîtir hebaya.

Tîrêj zêde teqlîdê dike yan na, şewaza taybetî bi xwe heye?

Ez hewil didim li her tiştî zêde pişta xwe bidime hêz, zaniyarî, fikr û hesta Tîrêj û ew taybetmendiyên xwezayî û siruştî yê dengê Tîrêj. Ji ber ku her hunermend pişta xwe nede hêza xwe, bi teqlîd û zarvekirinê nikare çî bike. Her çend ez li gellek mijaran de dijî hemû rengê teqlîdê ninim, ji bo ku min bawerî bi vî tiştê heye ku gellek caran teqlîda bi reng û teknîkek baş, pêşveçûn û pêşketinê çê dike. Lê ya ku sebeb û asteng e li pêşiya pêşketinê de teqlîda bi rengekî xirab e nek bi siroştê xwe.

Tu ji bilî karê xwe yê hunerî bi çi karek din ve mijûl î?

Vê gavê ez tenê bi karê xwe yê hunerî mijûl im, ez bawer im divêt gellek zêdetir xemê pêve bixwe, zêdetir ked bidim û zêdetir demê jêre danê heta ku ez bikarim pîlan û pirojeyên ku di serê min de hene, bêxme jiyane.

Tîrêj hunerê wekî alavek ji bo bijîva jiyanê bikar tîne yan na armanc xizmet e?

Bi rastî gellek caran min bi xwe gotiye ku heger mijar xwe dane jiyankirin, nav û qazancên kesayetiyê

biban, Tîrêj dikarî gellek tiştên dinê bike. Bes huner cewherê e ku di kesayetiyê Tîrêj de dijî. Ew jî çavkaniyê ji rastiya jiyanê Tîrêj digre. Ya girêdayîbûna Tîrêj bi axa wî, welatê wî, dayîka wî, welatparêziya wî, xem û xeyalên wî û ... ve çavkaniyê digire. Bona wê ku ez jî bikarim bibim bi bersivê, hêviyek, dengê û çareseriyek ji bo êş û janên gelê xwe û di pêşveçûna gelê xwe de min jî parek hebe, min dest bi vî karî kiriyê û gellek jî bi vî çendê keyfxweş û serfiraz im.

Serfiraz im ku min di dilê gellek mirovên Kurd de cih girtiye, lewra girîng nine li vî pêşveçûnê de ez têr bim yan bîrsî. Ji boy min girîng, erk û wezîfeya min ya welatparêzî û netewî ye.

Tîrêj zêde kete bin bandora dengê çî hunermendekê û niha zêde hez ji dengê kê/î dike?

Ez zêde ketim bin bandora stranên şoreşê yê welatparêziyê, evîna welat û evîna dayîkê. Bêşik dengê mamosta Şivan Perwer, Xelîl Xemgîn, Morad Bektaş, Bederedîn Coxkûn, Tehsîn Taha, Omer Dizelî, Eyaz Coxoyî û Erdewan, Hesen Zîrek û Hesen Cizrawî pir bandor li min kirine û ez pir ji wan hez dikim. Lê herî zêde ku ez hez ji dengê wî dikim û bandorê ji min dike, dengê hunermendê nemir, şehîd Serhed e.

Pîskolojî dibêjin muzîk xwarina ruhê mirov e, raya te li vî derheqê de?

Ez bi tevahî ligel vî raman û dîtîne me. Ger mirov ji aliyê ruhî - pîskolojî ve rastiya muzîkê binirxîne, dibîne ku bi muzîkê dîlan digere, reqs û sema bi muzîkê tê kirinê, muzîk xemrevîn e, xweşiyên mirov bi muzîkê serxweş dibin. Gellek caran girîngê di dilê mirov de heye û muzîk wî/ê mirovî/ê têr bike, bibe bersivê bo hevîyên bê bersiv, bibe rexneyek ji bo çareserkirina kêmaniyên wî/ê, bibe pêşniyazek ji bo pêşveçûna birêk û pêktir û baştir birêvebirina karên wî/ê. Bi giştî haletê nefsi yê muzîkê heye ku tesîrê ji mirov dike û rêxweşker e ji bo çareseriyê gellek pirsgrîkên pîskolojîk.

Muzîk û stran çî rolekê li ser nasandin û parastina nasnameya netewî de dilîzin?

Bêguman muzîk û stran parek in ji çanda netewî. Bi sedan û hezaran stranên me hene ku temsîla hestê însanê Kurd, mêraniya mêrên Kurd û ... dikin. Bi sedan stran û dastanên me yê qehremaniyê wekî Evdalê Zeynê, Mem û Zîn, Ferhad û Şîrîn, Xecê û Siyamend, Derwêşê Evdî û ... hene ku rola hanê lîstine. Lewra rastiyeke heye ku di parastina hemû nîrxên pîroz yê netewî û çandî de muzîk û stranê rolek gellek girîng lîstine û bi rastî jî ger heya îro stranên me yê folklorî, dengbêjî û muzîka me ya gelêrî nebûna, belkî niha ew qas reqs û dîlana Kurdî, kîncên Kurdî, hest û îhsana me ya Kurdîniyê, hesta welatparêzî û heta zimanê Kurdî jî nedibûn.

Tu rewş û zirûfa stran û muzîka Kurdî di çî astekê de dibîni?

Ger em tenê bi stran û muzîka Kurdî bi sînora bikin, wê demê divêt em zirûfa niha tevî 10 – 20 salên borî berhev dibin. Bi raya min gavên baş hatine avêtin. Di hemû warên muzîkê de, him li warê berhemê muzîkal, him deng, him di pêşvebirina şewazên Kurdî de,

him jî di sistembûna stranên nûjen de gavên baş avêtine. Encama ked û zehmet, fedakariya wan dengbêj û stranbêjan, muzîsiyanan gellek baş û berbiçav e.

Lê xeletî jî di hin mijaran de hene ku bûne sebeb hunera Kurdî nekare rikeberî û berêkanê tevî hunerên dinê bike. Ji wan sebebana: Kurd heya niha ne xwedî sistemek wiha bûye ku mafên netewî yên wî di nav çarçove û parçên Kurdistanê de li warê însanî, rewşenbîrî, çandî, siyasî û civakî de bê parastinê, ku hunera stranê û asta stranê bi wê ve girêdayî û kifîdkirî ye. Bi giştî li salên 1991'an şûn de mirov dikare bibêje li Başûr de derfet, hêvî û baweriyek ava bûye ku li ser vê bingehê gavên hîna baştir û geştir bihên avêtin. Ez bawer im bi hevgerîna, yekgirtina hunerî û hunermendên Kurd li hemû parçên Kurdistanê û derveyî welat de hîna gavên baştir û biserketîtir bîna avêtinê û asta strana Kurdî baştir pêşve bibe.

Lê ji bo ku muzîka Kurdî bikare di çîhanê de nav û nasnameyek bilind û serkevtî bidest bixe, hîna pêdivî bi qehremanetî, ked û xwehdanê heye.

Kek Tîrêj, kêmasiyek li herêma Kurmancîxiv a Rojhilatê Kurdistanê de heye ku zêde berçav e, ji ber ku tu bi xwe jî xelkê vê herêmê yî û mirov dibîne ku gellek dengxweşên me li wir hene lê bi awayekî zanistî û pirofesyional hunerê naşopînin û zêde xwe girêdayî bi dîlan û dawetan dikin. Raya te wekî hunermendekî wê herêmê çiyê?

Li wê herêma Rojhilatê Kurdistanê de yanî li Urmiyê ber bi Selmas, Xwey û Makûyê nêzîkbûna sisteme, siyasat û danûstandina sisteme, zext û zorên sisteme li ser hemû warên civakî, çandî yê Kurdan bandorek yekcar perçe ava kiriye. Wê bandor, zext û zorê û vê asmilasyonê kesayetiyan lawaz çê kirine. Her wiha derfetên bingehîn ji bo pêşxistin yan avakirina destpêkê karê hunerî yan ji bo bersivdayîna xeyalên hunerî yên ku li mêjiyê însanan de şîna dibin yan însan di wan xeyalan de dixwazin karê hunerî bikin. Nebûna wan derfetan rê li ber avabûna kesayetiyan hunerî li serhedê Rojhilatê Kurdistanê girtiye. Hemû tevî hêvî û xeyalên wan bi tesîrê sisteme hatine parçekirin. Di nebûna stranbêjan ku bi rengekî profesyonel û akademîk, ku li vê herêmê de karê hunerî dimêşînin û didine jiyankirinê, tesîra herî xirab û berbiçav daniye ser wê herêmê.

Her çiqas ku me stranbêjan gellek dengxweş di wê herêmê de hene, lê bi sînorbûn û tevlibûna wan bi dawet û dîlanan û her wiha lawazbûna kesayetiya hunerî ya wan yan tesîreke gellek xirab li ser stran û serhedê Rojhilatê Kurdistanê heye.

Bes hêvî heye ku ciwan û lawên me yên Rojhilatê vir pêve bi eşq û hezkirin, bi bawerî û bi hest bi berpirsatiyê bikarin we hêzê di xwe de çê bikin û wan rastiyan li xwe de bibînin, cesaret û îradeyê bidin xwe û li vê rêyê de hev xem, hev derd û hevalê derd û janên gelê xwe bin, hevalê rêya pêşveçûna karê hunerî di pêşvebirina xebatên stran û stranbêjan de bin.

Bi raya Tîrêj muzîka Kurdî heya çiqas ketiye bin bandora muzîka biyanî de bi taybet muzîka dagirkerên Kurdistanê?

Niha ew nîqaş û nirxandin ne tenê di nava Kurdan de, belkî di nava civakên din de

jî heye. Pêşveçûna teknolojiyê bandor li hemû çîhanê kiriye. Îro rojê stranên ku li Amerîkayê tê gotin, em bi rêya teknîkê ve li vira guhdarî dikin. Em bixwazin û nexwazin jî, ciwanên me tevî wê pêşveçûna zanist, teknolojiyê û înternetê bûne û di bin bandora wê de dijîn. Bi vî awayî ew hunermendên ku ji wan ciwanan çê dibin, ketine bin wê bandorê de. Hêdî hêdî civak asmîle dibin û dikevin bin bandora wê de, him jî aliyê çandî, hunerî, ziman û

Muzîk û stran jî yek ji wan mijaran e ku bêbandor najî. Hunera muzîk û stranê yek ji fakterên naskirina netewan e, ji fakterên pêşvebirina neteweyan e. Her wiha divêt mirov ji bîr neke ku hunera muzîkê navek çîhanî û nasnameyek çîhanî heye û mirov nikare wê bi sînora bike. Bi kurtî bandora xwe li ser strana Kurdî di her çar parçeyan de hebûye û bi taybet ya Turk, Fars û Ereban li ser çand, kultur, fikr û ramana me heye. Lê ya baş eva ye ku em tiştên baş ji wan bigirin û yên xirab rexne bikin û di nav xwe de



“ROLÊ HELBESTÊ NE DÛR JÎ ROLÊ MÛZÎKÊ YE, BES HER YEK BÎ RENGEKÎ XÎZMETÊ DÎKÎN

hildin.

Tîrêj can, te ji kengê ve dest bi nivîsandina helbestan kiriye?

Min ji sala 97 – 98'an vir ve, dest bi nivîsandina helbestan kiriye.

Helbest bal te tê çî wateyê?

Bi raya min rolê helbestê ne dûr ji rolê mûzîkê ye, bes her yek bi rengekî xizmetê dikin. Çawa ku stranê gellek nixxên çandî yên Kurdan parastiyê û heya îro rojê anye, helbest jî parçeyek ji rastiya Kurdan e.

Dema ku mirov helbesta Ehemdê Xanî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran û Cigerxwîn, Ehmedê Nalbend, Sebrî Botanî û ... dixwîne, mirov naveroka fikrî, felsefî û rewşenbîriya dewlemend ya wan digre, lewra helbestê jî parek girîng û dewlemend di pêşvebirina çanda Kurdî de hebûye.

Ez dibêjim helbest ji cewherêkî xurt,

bihêz, pir ji hest ya mirovan di pêşvebirina karê rewşenbîrî de ye.

Kek Tîrêj, tu di helbestên xwe de zêdetir girîngiyê didî çî aliyekê?

Ger ez helbestên xwe çî li ser evîniyê, çî li ser siyasetê û çî jî li ser xerîbiyê binivîsim, dê bêhna axa min ji van bê, lewra min tu caran cehd nekiriye ku helbestekê yan tiştêkê çê bikim yan binivîsim ku bêhna axa min jê nehê.

Bêguman her huneremendekê astengiyan taybet li ser rêya xwe hene, astengên ser rêya hunermend Tîrêj çî ne?

Hemû hunermendan hin pirsgerêkên sabit hene bi taybet hunermendên Kurd.

Ew jî nebûna sistemek birêk û pêk ji bo pêşvebirina karê wan, nebûna derfetên hunerî wek nebûna stodyo, teknîk, deng û wênegirtina kilîpan û ji hemûyan girîngtir nebûna yasayekê ji bo parastina mafê bingehîn yê hunermendan. Bi giştî evana pirsgerêkên ser rêya pêşvebirina karê hunerî û karê hunermendan in.

Lê astengiyek din ya girîngtir jî heye, ew jî diyardeya kopî raytê ye. Raya te li wê derheqê de çiyê?

Rast e. Eva diyardeyek e ku hemû hunermendên Kurd ji destê wê de dinalînin. Lê ji kopîraytê girîngtir, nebûna yasayekê ji bo parastina mafên hunerî yê hunermendan, çî helbestvanan, çî çiroknivîs, çî stranbêj û çî jî muzîsiyanan e. Nebûna vî mafî û vê yasayê derbeyek gellek mezin ji hunera Kurdî, ji hunermendên Kurd, ji pêşveçûna hunerî li hemû Kurdistanê de xistiye.

Hêviya min ev e ku li Başûrê Kurdistanê ew tiştên ku bi ziman û teorî tîna gotinê, di piratîk de jî bikeve liv û hereketê û piratîtze bibin.

Em bixwazin yan nexwazin wê diyardeyê hunermendên Kurd lawaz kirine. Ji ber ku yek ji fakterên herî girîng ku serkeftina hunerî gerantî dike, madiyat(matreyal) e. Ez bawer im ger mafê hunerî û hunermendan bê parastin, hunermend dê bikarin berhemên baştir û birêk û pêktir çê bikin û baştir xizmeta gelê xwe bikin.

Diyare ev behse, ne bi wê wateyê ye ku tu tişt nehatiye kirin û em nedîtî dibînin. Ji ber ku hemû hewlên me ji bo baştirkirina vî karî ye û hêviya min ev e ku li warê yasayî ve lêpîrsîn bo vî karî were kirinê û hikûmet bi micidî li ser vê yekê rawest e.

Pilan û pirojeyên te ji bo pêşerojê?

Niha albûmek li ber destê min de ye ku ji 12 stranan pêk tê, 9 stran Kurmancî, 2 bi soranî û yek jî Zazakî ye. Her 9 stranên Kurmancî ji peyv û awazên min in. Her wiha di dema pêş de dê çend konsertên min li derveyî welat, li Bakûrê Kurdistanê û li Başûrê Rojava dê hebîn. Her wiha ez dê li ser pirogarmek televizyonî kar bikim û wekî pêşkêşkar dê wê pirograma rewşenbîrî birêve bibim.

Peyama te ji bo xwendevanên Agirî?

Silavên bê sînora ji xwendevanên we dikim û serkevtinê ji wan re dixwazim. Hêvîdar im di pêşvebirina karê we de, hîna ji we re destek û alîkar bin.

Sipas ji beşdariya te di wê hevpeyvinê de.

Ez gellek keyfxweş û serfiraz im ku ev derfeta ji bo min pêk hat demekê xweş bi rojnameya Agirî re bim.



Di Kiryara Terorîstî Ya Şengalê De, 500 Kes Mirin û 375 Kes Jî Birîndar Bûn



Roja sêşem, 14'ê Tebaxa 2007'an li bajarê Şengalê li Başûrê Kurdistanê 4 otombêl hatin teqandin û di encamê de û li gorî agahiyê herî dawî 500 hatine kuştin û 375 kes jî birîndar bûn.

Teqînên han ên terorîstî li Komelgeha Sîba - şêx Xidir û gundê Tel Ezer yê girêdayî Şengalê hatin pêkanîn.

Li gora ragihandina Ajansa Peyamnêrê, jêderê şandeya lêkolînê ya bûyera Şengalê bêyî ku navê xwe bêje ragihandiyê ku Sûriye li paş êrîşa Şingalê ye.

Berpirsiyarên Mucahidîn Xelq A Îranê Dê Bi Tawana Kuştina Xelkê Îraqê Bihên Dadgehîkirin

Serdozgerê Giştî yê Îraqê ragihand ku 150 kes ji endamên Rêxistina Mucahidîn Xelq a Îranê û ji



wana Mesûd Recewî û Miryem Recewî ji berpirsiyarên vê rêxistinê bi tawana kuştina xelkê Îraqê li serdemê hikûmeta berê de dê bihên dadgehîkirin.

Li gorî agahiyên ji zimanê Cefer Mûsewî ve, rêxistina navhatî di kuştina Îraqîyan û bi taybet îşkencekirina wan de rolek mezin hebûye.

Navbirî herweha ragihand ew kesên ku ser bi wê saziyê ne, navê wan jî di lîsteya 150 kesî de hatibe li her cihekê bijîn, dê bo dadgehê bihên gazîkirin.

Behadîn Edeb Koça Dawiyê Kir

Roja pênçsem, 15.08.2007'an, Behadîn Edeb, endamê berê yê Meclîsa Şêwra Îslamî a Îranê bi sebeba nesaxiyê Penceşêrê li



nexweşxaneyê Mêhr a Tehranê de jiyana xwe ji dest da. Navbirî di wan 3 salên dawîn de tûşî nesaxiyê Penceşêrê bibû.

Behadîn Edeb yek ji kurdên nasiyar li Kurdistanê Îranê bû. Wî bi hevkarîya çend kurdên din bo yekem car karî feraksiyona Kurd li Meclîsa Şêwra Îslamî ya Îranê de çê bike. Ew du gerran nûnerê xelkê bajarên Sine û Kamyaranê di Meclîsa Şêwra Îslamî ya Îranê a pênçem û şeşem de bû.

PDK Îranê di vê derheqê de daxuyaniyek weşand û serxweşî ji malbata wî kir.

Ebdulah Gul Take Berendamê Serok Komariya Turkiyê Ye



Piştî civîna Komîteya Navendî ya Birêveberîya Partiya AKP'ê ku Partiya desthilatdar ya Turkiyê ye, diyar bû ku ew dubare Ebdulah Gul ji bo hîlbijartina Serok Komariyê berendam dikin.

Siyasetvanên Sekolar û Arteşa Turkiyê tevî berendamîya Gul dijberî kirine.

Roja 20.08.2007'an hîlbijartina Serok Komariya Turkiyê tê lidarxistin. Divêt berendam 2 ji 3 (367 ji 550) a dangan bidest bixin.

AKP'ê niha 341 deng di Parlemana wî welatî de heye.

Malbatekê Ji Ber Hejariyê Rêya Xwsekuştinê Da Pêşya Xwe



Çîroka xwekuştina bikom ya malbata Misrî dengvedaneke zaf hebû, bi taybetî piştî wê ku derket ji ber belengaziya xwe kuştin e.

Goriyên vê bûyerê pêkhatîne ji: Bavê 60 salî û du keçên derçûyê zanîngehê ku tu yek ji wan nehatibûn damezirandin. Mehekê berê ve bûyerê jî xortekî wê malbatê ji rêya bûyera tîrombêlê canê xwe ji dest da.

Ew malbate xelkê Qahîreya Misrê bûn. Li gorî lêkolînên polîs, ew malbate di bin hêla hejariyê de jiyana e û ji ber desttengiyê alev û kel û pelên nav mala xwe firotine û li ser erd dirûnîştin û ji aliyê çîranan ve dihatin piştevanî kirin.

Li gorî çavkaniyan her du keçên 25 û 26 salî dermanê Lancoşîn xwarine ku ji bo nesaxiyên dil tê bikaranîn. Dema ku bavê wan pêdihese, li cihê wê ku wan bigihîjîne nexweşxaneyê, 20 heb ji wî dermanî dixwet û xwe jî tevî karwanê miriyên wê malbatê dike.

Şîr Di Parastina Rûçik û Sûmetê Jinan De Mifaheke Baş Heye

Li gorî lêkolînên pizîşkî, şîr mifaheke gellek



baş di

parastin û bedevhiştina sûmetê jinan de heye û tim rûçikê wan bi nermî û terr dihêle.

Vekolînên nû dan zanîn ku ger şîr tevî ava Ceh û Gulavê bihê têkelkirin û piştê jî mirov wê ji rûçik û sûmetê xwe bihisût û bo midehê 20 deqîqeyan pêve bihêle û paşan jî bi ava şîrtên bişot, wê demê rûyê mirov ciwan û xweşik dike.

Her wiha lêkolîn didin zanîn ger ku kirêman yan melhemek ji şîr û 2 kewçik ji lîmoyê bihê çêkirinê û piştê ser û çavan bihisûn û piştî 15 deqîqeyan bişon, wê demê ser û çawê mirov nerm û saf dike ku eva jî dibê sedema ciwankirina sûmetê mirov.